kovara hunerî, çandî û lêkolînî ya kurdên anatoliya navîn

bîrnebûn

BIHAR/2009



Reinerstraße 34, 47166 Duisburg, W. Tyskland

Li ser şêxbizinên Haymaneyê

Mahmutlu köyü anatomisi üzerinden
Şexbılan aşireti tarihi

41

www.arsivakurdi.org

bîrnebûn

Tidskriften utkommer 4 nummer per år.
Sê mehan carekê derdikeve / Üç ayda bir çıkar.

Utges av Apec-Förlag AB

Hejmar 41 bihar 2009
Ansvarig utgivare
Ali Çiftçi

Redaksiyon
A. Çiftçi, Dr. Mikaîlî, H. Erdoğan, M. Bayrak, İ. Türkmen
M. Duran, Muzaffer Özgür, Nuh Ateş, Sefoyê Asê, Vahit Duran

Adress
Navnîşana li Swêdê
Box: 8121, SE 163 08, Spånga/Sverige
Telefaks: 0046-(0)8-761 24 90

E-post
info@birnebun.com

Internet
www.birnebun.com

Têkilî/İlişki
Danimarka: Irfan Baysal, 0045-27 11 58 83
Avusturya: Cüneyt Dagdalan, 0043-69 91 11 55 294

Belavkirin / Dağıtım
Ewrupa: Muzaffer Özgür/Bîrnebûn
Postfach 900348 , 51113 Köln / Almanya
Tfn: 0049-172 298 24 51

Türkiye/Ankara:
Dipnot Kitebevi, Selanik Caddesi No: 82/32
KIZILAY / ANKARA
Tfn: 0312-419 29 32

Anatolia Muzik Center
Cumhuriyet Mah. Turan Cad. No: 29 A
Polatlı-Ankara
Tfn.: 0090-312-622 94 36

İstanbul: Selahattin Bulut/Medya Kitapevi
İstiklal Caddesi, Elhamra Pasaj No: 130/6, Beyoğlu

Biha/Fiyatı
Europa: 5 Euro • Türkiye: 2,5 YTL

Abone
Swêd: 400 SEK • Almanya 40 Euro
Welatên din ên Ewropayê: 50 Euro

İsveç hesap numarası
(Bîrnebûn) postgiro: 468 65 12-7

Ji bo aboneyên li derveyî Swêdê / İsveç dışındaki aboneler için
APEC, "Bîrnebûn" PlusGirot-Stockholm/Sweden
BIC: NDEASESS
IBAN: SE85 9500 0099 6026 4686 5127

Çap / Baskı
Apec-Tryck AB

ISSN 1402-7488



Özlem Çekiç di ofîsa xwe ya parlementoyê de

Her nivîskar berpirsê nivîsa xwe ye.
Mafê redaksiyonê heye ku nivîsên ji Bîrnebûnê re tên, serrast û kurt bike. Ger nivîs çap nebin jî, li xwedîyan nayên vegerandin.

Waqfa Kurdên Anatoliya Navîn li Swêdê û Komela Ziman li Almanyayê piştgirên kovarê ne.

www.arsivakurdi.org

NAVEROK / İÇİNDEKİLER







Wêneya li berg: Dimenek ji fabrika Thyssen
Foto: Harald Finster



2 JI BÎRNEBÛNÊ - Ali Çiftçi

4 HILBIJARTINÊN HERÊMÎ YÊN 2009 - Nebî Kesen

6 "GAWESTÎ" - Îrfan Baysal

8 AXAFTINA BAŞBUĞ: ÎRONÎYEK "NASNAMEYA NETEWÎ YA TIRK" - Nebî Kesen

12 SÛRETEK Û ÇEND GOTIN - Rohat ALakom

14 ÎSKEÎSKA BEXTA PÎNEKIRÎ - Xizan Şilan

16 EHSAN BIRA - Mahmut Tiftikci

19 XÊRA MIRIYAN - Mem Xelîkan

21 Lİ SER ŞÊXBİZİNÊN HAYMANEYÊ Û KOKA NAVÊ WAN - Nuh Ateş

31 SALNAMEYA ZERDEŞTÎ Û SALNAMEYA MÎLADÎ - Şexmus

33 ROJEK JI ROJÊN MIN - Altun Başaran

35 REINERSTRASSE 34 47166 DUISBURG, W. TYSKLAND - Sefi Doğan

43 LEWENDÊ - Gursel Qemerî

44 MAHMUTLU KÖYÜ ANATOMİSİ ÜZERİNDEN ŞÊXBILAN AŞİRETİ TARİHİ -1- Vahid Duran

57 DANIMARKA PARLAMETOSUNDA MILLETVEKILI, ÖZLEM ÇEKIÇ - Muzaffer Özgür

61 GİZLİ BELGELER IŞIĞINDA DERSİM KATLİAMI VE DERSİM'İ TASFİYE - Mehmet Bayrak

67 ÜNLÜ KÜRT ŞAİRİ ŞEYH RIZA TALABANİ VE TÜRKÇE ŞİİRLERİ - Mehmet Bayrak

72 AKSARAY ZAZACASI -I- Nêçîrvan Qilorî





www.arsivakurdi.org

Xwendevanên delal, ev hejmara biharê herçiqas hinekî bi derengî ketibe jî bi rûpelên dagirtî ve em dîsa bi we re ne û em bi wê dilşa ne.

Bihar ji bo her însanekî li nav xelkê xwe û li ser erdê xwe xweşiktirîn bihar e. Bi gulvekirin û hêşinayîyê re rengekî din tê jiyana meriv di biharê de! Lê ji bo gelê kurd bihar her bûye demeke êş û kederê! Di vê demsalê de şer, komkujî, dert û goçberî her bûye hevalbend ji me re.

Jîyana kurdên me yên Anatoliyê jî parçeyek ji jîyana gelê kurd ya bi tevayî ye.

Piştî vê jîyana kampax, goçberî jî bûye parçeyek ji jîyana me. Gotineka ewropiyan heye dibên; *yê ku carê bûye goçber, herdem goçber e!* Ev gotina bi taybetî ji bo kurdên me yên Anatoliyê rast lê tê!

Ji dema ku kal û pîrên me ji ser axa xwe veqetiyane vir ve, ev goçberiya her berdewam e. Gotineka kurdî jî li ser goçberîyê heye, hema hema eynî maneyê dide. Kurd dibên; *bila hêlûn nexule, hêlûna xulî çênabe!* Di nav malbatên kurdên Anatoliyê de, tu malbatek nemaye ku endameka/kî ji malbatê nebûye goçber. Goçberiyek ku wek topek lêkeve, her yek bi welatekî ve çûye û her yek bûye xwedî kesayetiyeka cûda!

Êdî li Anatoliyê çênabe ku tu însanên me tenê bi navê gund an êşîra van bi nav bikî. Gotinên wek kurdên Elmanyayê, kurdên Swêdê, kurdên Îsviçrê, kurdên Danîmarkê, kurdên Hollandê, kurdên Fransayê û h.w.d. li gor welatên Ewropa têne bi nav kirin.

Ne tenê ev, herwiha rabûn û rûniştin, danûstandin û zimanê wan jî li gor welatên ku lê dimînin, nav û reng girtine! Bi gotina kurdî *"wek wan bûne!"*

Piraniya zarokên kurdan, çi li metropolên Tirkîyê bin û çi jî li welatên Ewropayê bin, bi zimanê xwe nizanin. Pirê caran endamên malbatekê; pis û pismam, dot û dotmam, xal û xwerzê, ap û birazê ji ber ku zimanên hev nizanin, ne danûstendinekê bi hev re dikin û ne jî hev dinasin! Ev e, têkçûn û windabûyîna miletekî!

Li gel vê rastiyê, rastiyeka din jî heye ku li derveyî welêt merivên me ji bo erf û edetên xwe biparêzin, çi ji destên wan tê, ew dixwazin bikin!

Lê li derveyî welêt parastin û pêşxistina çand û edetan jî bê rêxistiniyên civakî zahmet e! Bo nimûne dema şîn û şayiyek dibe, ev rastîya pir vekirîtir dixuye!

Jîyaneka bê şîn û şayî jî ji xwe tuneye! Îro li serê nas an cîranekî be sibê dê bê serê me giştikan. Ji bo wê jî tevgereka civakî ya sosyal pewîstiyek girîng e!

Berî 12 salan dema kovara Bîrnebûnê dest bi weşandina xwe kir ji gelek derûdor û ji însanên cihê cihê, name û pîrozbayi dihatin û di nava wan nameyan de her hêvî û daxwaz dikirin ku divê meriv bi rêxistînî be û heta daxwazên siyasî jî dihatin kirin. Bersiv û duruşma me hertim yek bû, me digot; em tenê kovareka lêkolînî ya folklorîk û çandî derdixin.

Belê, armanca me jî her ev bû û îro jî em di vê şopê da ne! Lê jîyan hinek karên din jî dide ber me! Çênabe em tenê hertiştên li ber windabûnê berhev bikin. Divê em ji bo ku winda nebin jî bibin xwedî mekanîzmeyekê! Ji ber vê yekê jî ji bo dîtin û pêşnîyarên di vî warê de rûpelên kovara me ji herkesî re vekirîne!

Erê, di vê hejmarê de bi sernivisa *Hilbijartinên herêmî yên 2009* û herwiha dîsan bi ser-

www.arsivakurdi.org

nivîsa *Axaftina Başbuğ: Îroniyek "Nasnameya Neteweya Tirk"* gotina serokerkanê Tirkiyê Îlker Başbuğ ya 14 nîsanê ku di Akademîya Eskeriyê de kiribû, hûn ê van herdu şiroveyan ji qelema birêz Nebî Kesen bixwînin!

Gawestî navekî di nav kurdên Anatoliyê de pir tê ser ziman dema behsa goçberiyê dibe! Eşîrek bi vî navî tê bi nav kirin. Mahmud Erdem ku bi xwe ji gundê Hecîlera ye, ji xortaniya xwe vir ve her di nav komele û sazîyan de bûye, îsal kitêbek bi navê "*Gawestî*" bi zimanê danîmarkî derxist. Li ser xebata wî, Îrfan Baysal pê re kurte-sohbetek bo danasîna wî kiriye.

Rohat Alakom bi sernivîsa *Sûretek û çend gotin* parçeyek ji jîyana Seîd Kırmızıtoprak (Dr. Şivan) ku li Anatoliyê maye bi me dide nasandin.

Mem Xelîkan bi kurteçîroka *Xêra miriyan* di vê hejmarê de jî em bi tenê nehiştin.

Birêz Nuh Ateş bi navê *Li ser Şêxbizinên Haymaneyê û koka navê wan* bi nivîseka berfireh ya di aliyê sosyolojîk de balkêş lêkolaye.

Altun Başaranê rojek ji jîyana xwe bi sernivîsa *Rojek ji rojên min* bi we xwendevanên delal re par ve dike.

Birêz Seyfî Doğan ji dîroka nû bi sernivîsa *Reinerstrasse 34 47166 Duisburg* serpêhatî û bîranîneka xwe ya li Elmanyayê nivîsiye.

Seyfî Doğan diya xwe di meha nîsanê de winde kir. Li vir em ji wî û malbata wî re dibên; serê we sax be, ciyê diya we bihuşt be!

Mahmutlu Köyü Anatomisi Üzerinden Şêxbılan Aşireti Tarihi -1 birêz Vahid Duran di dîrokê de kronolojîk serpêhatiya eşîra şêxbilan bi zimanê tirkî lêkolaye!

Özlem Çekiç, ji neslê nû, ji Antoliyê di hilbijartinên sala çûyîn de wek miletwekîlî hat hilbijartin û di parlamentoya Danîmarkê de cih girt. Muzaffer Özgür bi hevdîtinekê wê bi we dide nasandin.

Nivîsa birêz Mehmet Bayrak a bi sernivîsa *Gizli Belgeler Işığında Dersim Katliamı ve Dersimi Tasvîye* ku di hejmara 40î de bi kêmasî hatibû belav kirin, bi serrastkirina wê, em careka din çap dikin. Li vir, em hem ji we û hem ji birêz Mehmet Bayrak lêborina xwe dixwazin!

Birêz Mehmet Bayrak bi sernivîsa *Ünlü Kürt Şairi Şeyh Rıza Talabani ve Türkçe Şiirler* hem Şêx Riza Talabanî bi me dide nasandin û hem jî ji berhemên wî çend nimûnan dide.

Birêz Nêçîrvan Qilorî bo we ne navekî namo ye! Yek ji wan nivîskar û alîkarê Bîrnebûnê ye. Ji ber karên xwe demekê me navê wî di kovarê de nedît! Di beşa ziman de li ser kirmancki (dimilî) ya Aksarayê wek beşa yekê *Aksaray Zazacası* -1- nivisîye. Ev ê wek zîncîre her berdewam be. Em li vir bo birêz Nîçîrvan dibên; tu bi xêr hati!

Kilamên şînan di çanda kurdan de ciyekî xwe yî xas heye. Çi mêr û çi jin, herkesî li ser şînê distira. Di van salên dawî de pirê caran ev kilamên şînan ji aliyê jinan ve têne gotin. Di kewneşopiya kurdan de stranên şînan ku ji aliyê mêran ve hatine gotin bi giranî ne.

Birêz Mahmud Tiftikcî berî bi duh mehan birayê xwe Ehsan ku li Swêdê dima, wenda kir. Bila serê wî û malbata wan sax be! Em di vê hejmarê de kilama ku Mahmud li ser birayê xwe, Ehsan straye diweşînin.

Bi hêviya ku ev hejmar jî li gor dilê we be bimînin di xêr û xweşiyê de!

Ali Çiftçi

www.arsivakurdi.org

Hilbijartinên Herêmî yên 2009

Nebi Kesen

Hilbijartinên herêmî yên 29ê adarê ji bo raya gîştî û sîyasetzanan bi du pirsan dihat meraqkirin. Yekemin: Partîya hikûmetê, AKPê yê bikare reyên xwe yên hilbijartinên 27ê tirmeha 2008an biparêz e? Hilbijêr li bajaran mezin yên kurda wek Amed yên kîjan partî, DTPê yan jî AKPê, tercîh bikin? Duhemin: DTP çiqas reyan bigire û ê kîjan şaredariyan bi dest bixe?

Ji bo kurdan, encamên hilbijartinan vê carê balkêş bûn. AKPê reyên xwe him li Tirkiyê him jî li bajarên Kurdistanê wenda kirin. Miqdara reyên AKPê li temamîya Tirkîyê ji 47% (2008) ket 39%. Li pir bajar, qeze û beldeyên Kurdistanê hilbijêr heta 30% kêmtir rey dan partîya Erdogan. Li alîyê din, DTPê reyên xwe pirtir kir û şaredariya 7 bajar, 51 qeze û 39 belde qezenc kir. Bi temamî, 2.271.566 hilbijêr bi reya xwe DTP kirin partîya çarem ya Tirkîyê. Li herêma Kurdistanê DTP bû partîya yekem. Li pir bajar û qezeyan, şaredar ne jî DTPê hat hilbijartin, lê miqdara meclîsa şaredarîya DTPê li ser 50% bû. Şaredarîyên bajarên wek Mêrdîn, Riha, Bedlîs, Elezîz, Bingol, Meletî, Mûş dîsa ket para AKPê yan jî Partîya Saadetê. Ev jî rastî û kêmasiyek DTPê û hemû hêzên kurdan e. Li herêmên der Kurdistan jî DTPê bêhêz ma. Li Anatolîya Navîn tenê beldeya Xelkê Dondurma (Golyazi) tercîha xwe ya şaredarî bo DTPê kir.

Partîyek wek DTPê ku li ser nasnameya kurd avabûye û di bin êrîşên dewletê da ye, gora şertên partîyên din kampanyayek hilbijartinan nikare pêk bîne. Di vî warê da dezavantajên DTPê gelek pir bûn. Gerek AKPê û gerek hêzên dewletê bi hev ra êrîşek mezin ajotin ser DTPê. Ji alîyekî propagandaya ``terorîstîya dubarekirin`` li hember DTP kirin. Ji alîyê din jî di nav gel da bi eşkere leşker, polîs, walî û hêzên

Hilbijartinên herêmî 2009
Belavbûna rayan di nav pênc partîyên mezin da

Partî	Miqdar (%)	Hejmar
AKP (Partîya Edelat û Pêşvaçûn)	38,8	15.458.985
CHP (Partîya Gel a Komar)	23,1	9.218.445
MHP (Partîya Tevgera Netewîst)	16,1	6.403.831
DTP (Partîya Civaka Demokratîk)	5,7	2.271.566
SP (Partîya Saadet)	5,2	2.060.034

www.arsivakurdi.org

dewletê yên din alîkarîya AKPê kirin û rey ji bo partîya Erdogan xwestin. AKPê jî, pere û mal belav kir ku hilbijêr raya xwe bidin wê.

Hewldan û xebatên AKP û yên hêzên dewlet çiqas tesîr li ser encamên hilbijartinan kirîbe jî, DTP baş li berxweda û bi serket. Ji bo hikûmeta AKPyê û dewlet eşkere bû ku kurd êdî bi nasnameya xwe sîyasetê dixwazin û dikin. AKP, him nasnameya misilmanî û propagandaya ``biratî`` pêş xist, him jî îdeolojîya resmî li ser ``yeknetew bûn`` (tirkbûn) anî ziman. Lê, hilbijêrên kurd vê carê ewqas guh nedan gotinên vale yên AKPê.

Di hilbijartinên 2009an da DTP giraniya xwe da pirsgirêka kurd, nasnameya kurdî û daxwazên kurdan. Va jî bû sebeba serkeftina DTPê. Gerek li pîrozbahiyên Newrozê û gerek di pêvajoya hilbijartinan da heyecan û hëviyek mezin di nav gel û xebatkarên DTPê hebû. Hilbijartin ji bo herêman bû, lê atmosfer û kampanya yên hilbijartinan li Kurdistanê gelek bi mesajên sîyasî ji alîyê pirsgirêka kurd girêdayî bûn. Mirov dikare bêje ku berpirs û xebatkarên DTPê rola van hilbijartinan ji alîyê xweîdarekirina herêmî jî giring bû. Di vir da jî hilbijêrên kurd mesajek zelal dan ber çav. Gelê kurd êdî naxwaze ku partîyên tirk û kesên wan li herêmên kurd şaredariyan îdare bikin. Belê, li pir deran namzedên AKPê bi serketin, lê ew jî bi xwe kurd bûn. Gelek hilbijêran raya xwe dan van kesan, dîsan jî ji alîyê daxwazên Tevgera Kurd li dijî sîyaseta AKPê û dewletê bûn. Tespîtek van hilbijartinan ew bû ku kurd ji viraha ê xweîdarekirina herêman bixin destên xwe.

Kemasiyek hilbijartinan giring ew bû ku li bajarên Tirkîyê, berî her tiştî li Anatoliya Navîn DTP bêhêz ma û pir rayên hindik girtin. Va encam bi xebat û hewldanên DTPê ra girêdabû. DTP yan namzed dernexistin yan jî giraniya xwe di xebatên hilbijartinan da nenimand. Ji bona vê, li Anatoliya Navîn li gundê Xelkên Dondurma namzedê DTP bi ser ket. Ku ew jî ne bes e û divê bê guhertin.

Hikûmeta AKPê û dewletê nerazîbûna xwe bi encamên rayên DTPê zû eşkere kirin. Çend rojan paş hilbijartinan, operasyonek mezin li dijî berpirs û endamên DTPê dest pê kir. Ji sedê pirtir kes hatin girtin û niha guhdar mehkemeyên xwe dikin. Va gav tê wê manayê ku xebat û serkeftinên sîyasî yên kurdan di sîstema Tirkîyê da nayên qebûlkirin. AKPê xwest pêşiya xebata sîyasî ya kurdan û DTPê bi metodên ne demokratîk bigre, lê di hilbijartinan da negihîşt vê armancê.

Hêzên dewletê wek walî, kaymakam, ordî û polîs bi eşkere bûn teref û alîkarî AKPê kirin. Ji alîyên din jî pir asteng li ber DTPê tên danîn. Dawiya hilbijartinan tê xwestin ku bi girtin û cezadayîn DTP di xebatên xwe yên sîyasî da paş bikeve û hêza xwe qeyip bike. Erîşên li ser DTPê dibine ku dewlet hin jî ji çareserkirina pirsgirêka kurd re ne amade ye. Sîyaseta înkar û asîmîlekirina nasnameya kurd, di dema pêşda jî, ê di rojeva Tirkîyê da be.

www.arsivakurdi.org

"GAWESTÎ"

Jîyaneka bi rûmet û bi berxwedan. Mîna daxwazîya herkesî. Jîyaneke 40 salî, di nav gelê xwe û di nav komel û sazîyan de. Hen kes hene ku mudaxaleyê tevgera jîyanê dikin. Ez behsa kek Mahmud Erdem dikim. Ew li Danîmarkê dijî. Min ji bo xwendevanên **Bîrnebûn**ê hevpeyvînek pê re çê kir.



– Kek Mahmud merheba, berê em te nas bikin.
– Ez 1949an li Hecîlera hatime dunê. Dibistana yekemîn min li Hecîlera, pişt vê li Cîhanbeylîyê û lîse jî li Konyayê xelas kir.

– Dema tu li Konyayê di lîsê da bûyî tesîra sîyasetê li ser we hebû?
– Erê, piranî min giranî dabû ser pirtûkxwandinê. Min dixwast ez bi nivîskar bim. Wê demê min, bi hevalên alîyê me ra di komela dibistanê da cîh girtibû. Ên ku tên bîra min; Ali Kara, Fırat Kızılkaya, Hasan Sütçü û Ramazan Duran.

– Hatina te ya Danîmarkê çing bû?
– Dema ez li lîseyê da bûm, kurdîtîya li Fransa dibû, li ser min tesîreka giran kir. Ji bo wê min dixwast ez herim Fransa, lê nebû. Di 1968an da min xwe li Danîmarkê dît.

– Li Danîmarkê 40 sal, tu dibê çi?
– Ez 5-6 salan li fabrîkan xebitîm. Min mamostetî û karê vergerandinê (Tercumanî) kir. Di sala 1975an da me Yekîtîya Xebatkarên Tirkiyê (Türkiye İşçiler Birliği) ava kir. Di wir da tiştê balkêş dersên zimanî kurdî ye.

Ji alîyê sîyasetê da xebata dora sosyalîst û komînîstan bû. Ez endamê

www.arsivakurdi.org



Partîya Komînîst a Danîmarkê bûm. Di karûbarê partîyê da min di komîsyona karkerên goçberan da cîh girt.

Di 1982an da serokatîya Federasyona Komelên goçber kir (IND-Sam).

Me xebatên balkêş kirin. Me bi pênc zimanan rojnameyek derxist. Rojname ji bo xerîban bû. Yek ji wan zimanan kurdî bû. Rojname bi alîkarîya Wezîrê Çandîya Nordisk derdiket. Me kursa zimanê kurdî vekir. Armanca vê jî ew bû ku ji zimanê kurdî ra mamostetiya perwerdê bikin. Ji Danîmark, Swêd, Elmanya û Norweçê beşdar hebûn. Birêz M. Emin Bozarslan jî memostetiya kursê dikir.

– Kek Mahmud te pirtûkek nivîsandiye "Gawestî" li ser vê tu çi dibê?

– Gawestî bi çavên min jîyana min e. Goçberiya ji Kurdistanê heta Anatoliya Navîn, ji wir jî heta Ewrupa.

– Çima navê pirtûka te Gawestî?

– Va nava ji bo min semboleke îronîk e. Tu caran gayên wan nawestîne. Hertim gerîyane, di nav gerîyaniya wan da şoreşgerî heye. Şertên rindtir bibin hene. Di pirtûkê da di van 200 salên dawî da di şexsiyetiya kesan da bi çerokan dîroka xwe tînim ziman. Di wir da bi bîranînên xwe, bi dîrokê mesajan didim.

– Reaksîyona xwendevanan çing bû?

– Pirtûk gîşte armanca xwe. Çimkî xwe di vê pirtûkê da dibînin. Tiştên ku min nivisîne, ne ji bo têrbûnê ye, ji bo tamkirinê ye.

– Kek Mahmud bawer dikim êdî tu wastiyayî!

– Na, ez hîn jî dixebitim. Ez îsal jî di Partîya Sosyalîsta Gel (SF) li Şaredariya Brondby namzetiya xwe datinîm.

– Sipas, li dawî mesajên te ji bo Bîrnebûnê?

– Ji bo min pewîst e ku Bîrnebûn li pê dawêste.

İrfan Baysal

Berpirsiyarê Birnebûnê li Danîmarkê

www.arsivakurdi.org

Axaftina Başbuğ: Îronîyek
"Nasnameya Netewî ya Tirk"

Nebî Kesen

Serokerkanê Tirkîyê Îlker Basburg roja 14e Nîsana 2009an axaftinek li Akademîya Leşkerî kir. Axaftin ne tenê ji bo mensûbên ordîyê bû, lê ji bo raya gîştî wek konferensekê hatibû amadekirin. Ji bona vê, gelek rojnamevan û berpirsiyarên medyayê hatibûn konferensê. Televîzyonên tirk jî axaftina Başbuğ bi zindî weşandin. Naveroka axaftînê di raya gîştî da gelek hat niqaşkirin.

Giringî ya axaftina Başbuğ ji alîyê pirsgirêka kurd ew bû ku guhdarîyên kurdan û tirkan ji bona vekirina sîyaseta Tirkîyê di vê warî da hebûn. Ji mehan vir da behsa Konferensa Kurd li Başûrê Kurdistan dibû û dihat gotin ku Tirkîye jî alîkarî vê konferensê dike. Babeta konferensê divê li ser destberdina şerê çekdarî ya PKKê û çareserkirina pirsgirêka kurd bibiya. Ji alîyê din, hilbijartinên herêman yên 29ê adarê dan berçav ku kurd êdî bê veger xwedî li nasname û daxwazên netewî derdikevin. Di van şertan da pirsa sîyaseta kurd ya AKPê û dewletê ket rojevê. Wek tê zanîn, dewlet bi manayê pozîsyona ordîyê û sererkanîya wê tê ziman. Di sîstema sîyasî ya Tirkîyê da hêzên ordîyê ``xwedîyê dewletê`` ne. Ew, berî her tiştî, ji bo pirsgirêka kurd tenê xwedî qerer in.

Başbuğ, axaftina xwe li ser gelek babetên rojevê kir. Di vir da hinek ``dîtin û tespîtên`` ilmdar û lekolîneran jî, ji bona ``rastîyên`` tezên xwe anîn ziman. Piştî axtafina Basbus, aspekta balkêş ew bû ku rojnamevanên tirk mina cara yekemin navên van ilmdaran bihîstibûn û çend rojan pesandina Başbuğ kirin. Pir hindik kesan pirs kirin ku Başbuğ serokerkanê ordîyê yan jî seroka dewleta Tirkîyê ye? Hinek kesan bala nakokîyên axaftina Başbuğ kişand û rexne li ``tezên`` wê kirin. Axaftina Başbuğ, him jî bo demokrasî û him jî ji alîyê sîyaseta kurd ya resmî durbûna berpirsiyarên dewleta Tirkîyê eşkere kir. Çima ku, axaftina Başbuğ ne tenê ditînên wê bûn û ji aliyê grûbek ``şanermendan`` hatîbû nivîs kirin. Gotinên konferensê him ji dewletê ra û him jî ji hikûmeta AKPê ``prensibên resmî`` ne.

Babeta navendî ya axaftina Başbuğ bi pirsgirêka kurd ra girêdayî bû. Başbuğ, di tarîxa Tirkîyê û ordîya wê da cara yekemin wek serokerkan bi firehî û bi ``zimanekî ilmî`` li ser vê pirsê sekinî û ditînên xwe anî ziman. Di wir da du aspektên giring ``şîrove`` kirin. Yek aspekt li ser ``nasnameya tirk`` ya resmî û ``tirkbûna kurdan`` bû. Aspekta duhemin bi giranî asîmîlasyon bû. Herdu aspekt jî bingeh û sebeba pirsgrêka kurd ya Tirkîyê ne. Loma, dîtin û helwesta serokerkanîya tirk bi meraq hat guhdar kirin.

Pirsa nasnamê ne tenê ji alîyê Kurdan, di nav raya gîştî ya Tirkîyê da jê ji salan vir

www.arsivakurd.org

da tê niqaşkirin. Wek tê zanîn, nasnameya kurd ji alîyê dewletê hîn jî nayê qebûlkirin. Hinek îdarevanên tirk wek Demîrel, Ozal û Erdogan bi eşkere behsa kurdan û pirsgirêka kurd kiribûn jî, qebûlkirina resmî ya nasnameya kurd heta îro bû tabûyek. Başbuğ carek din ev bi axaftina xwe tesdiq kir. Wî mîna Atatirk û sazûmandarên Komara Tirkîyê yên din, îdîa kir ku kurd ``tirk`` in. Tarîfa vê jî bi ``Tirkîyeyê`` û hemwelatîyê ra gîrêda. Li gora Başbuğ, ``hemû kesên ku ji Tirkîyê ne wek tirk tên qebûl û îfadekirin``. Bi manayek din, tarîfa ``netewê tirk`` yan jî ``tirkbûn`` ne bi eslê etnîk ya tirk, lê bi ``Tirkîyeyê`` girêdayî ye. Argûmana vê tarîfê jî, Başbuğ gotinên Atatirk wek referens anî ziman.

Hat xûyakirin ku Başbuğ û berpirsên Tirkiyê yên din, bi rastî ji alîyê nasnameya kurd ji dema Atatirk vir da tenê gavek neavetîne û dîtina xwe ya resmî neguhertine. Ew nakokîyên di navbena tarîfkirina resmî ya nasnameyan û realîteya nasnameyên netewê fam nekirine û naxwazên jî fam bikin. Dijî tarîfên ilmî ku di civata navnetewî û dewletan da tên qebûlkirin, xwedî dewleta Tirkîyê pirs û tarîfa nasname ya netewî li gora xwe diguharin û bi vê şiklê hebûna nasnameya kurdî înkar dikin. Başbuğ jî baş dizane ku, tirkbûn bi eslê etnîk girêdayî ye û bi ziman, çand û tarîx ji nasnameya kurd cûda ye. tirkbûn ne ``nasnameyek ser`` e, lê etnîkî ye û ferqa xwe ya nasnemeyên din wek alman, ereb û kurd tûne.

Tarîfa nasnameya tirk ya resmî ku Başbuğ va tarîf anî ziman, çi dibe bila bibe, ne tirk dibin netewek din ne jî netewên din wek kurd, ereb û asûrî dibin tirk. Tarîfa di Qanuna Bingehî da jî ne bi îstiqrar tespît bûye û di pêvajoyê da hatîye guhertin. Ev jî wek îronîya ``nasnameya netewî ya tirk`` divê bê zanîn. Dema Atatirk, ango sala 1924an, va îfade li ser nasnameya tirk ketibû Qanûna Bingehî: ``Li Tirkîyê bi manayê hemwelatê ji bo herkesê, bê berçavdayîna ol û irq, ``tirk`` tên gotin.`` (Madde 88) Lê, va îfade di sala 1961an da wûsa hat guhertin: ``Herkes ku, bi Dewleta Tirk ra bi pêwendîya hemwelatî giredayî ye, tirk e.`` (Madde 54). Eynê gotin di Qanûn Bingehî ya 1982an (Madde 66) da jî cih girtîye. Him herdu tarîf ji hev cûda ne û him jî manayên pir ji hev dûr tên ziman. Ji alîyê din, tarîfkirina nasnameya netewê bi sîyaset û kêyfîyeta dewletê ra girêdayî ye û dikare herdem bê guhertin. Başbuğ behsa û sebeba vê guhertinê neanî ziman.

Kurd jî li gora tarîf û kêfa kesên wek Atatirk û Basbûg nabin tirk, çima ku ziman, çand, tarîx û hîsên kurdan cûda ne û ji bona vê jî netewek serbixwe ne. Ji alîyekî din, dewleta Tirkîyê bi rastî nasnameya ``netewê tirk`` li ser eslê tirkan ava kir. ``Hemwelatîyên Tirkîyê`` bi zorê zimanê tirkan, çanda tirkî û tarîxa gelê tirk, ango ne tarîxa gelên Tirkîyê ji 1923an şûnda, hîn dibin. Di Qanûna Bingehî (anayasa) û pir qanûnên din da parastin û pêşvabûna ziman, çand û tarîxa tirk bûye esasê sîyaseta dewletê di hemû beşên civakî da. Perwerdehî û çandî ya resmî li ser esasa etnîkîya tirkî pêk tê. Tarîxa tirk ya resmî bi rastî tarîxa tirkan yên hezar salan e ku dibistan, ûnîversîte û entstitûyên Tirkîyê vê tarîxê pêk

www.arsivakurdi.org

tînin. Li alîyê din ne behsa tarîxa kurd dibe, ne jî rewşa kurdan ber û paş ava kirina Komara Tirkîyê li sala 1923an tê gotin.

Başbuğ û kesên wek wî çiqas behsa ``Tirkîyêyî`` bikin jî, dîtin û şîroveyên wan bi sedîsed li ser nasnameya etnîkî ya tirk û înkarkirina kurdan û gelên din ê li Tirkîyê ava bûne. Çima ku, li Tirkîyê ne tenê sîyasetmedar û bûrokratên dewletê, gelê tirk jî tirkên ne hemwelatîyên Tirkiyê wek ``esîldar`` (soydaş) dibîne. Wek nimûne: kazak, tater, azerî û tirkmenên Iraqê li gora dewleta û gelê tirk ji esilê tirkan e û birayên wan in. Di van rojan da, medya û sîyasetmedarên tirk ji bo Ezerbeycan gotina ``du dewlet, yek netewe`` dikin. Va tê çi manayê? Ji alîyê din, tirk, kurd yan jî ermenîyên li der Tirkîyê wek bira nabîn in. Madam ku tirk, kurd, ermenî hwd. hemwelatê Tirkîyê ne û gora tarîfa dewletê ``tirk`` in, dive xwîşk û birayên kurdan û ermenîyan li dervayî Tirkîyê jî wek tirkên ku ne hemwelatê Tirkiyê ne, bên qebûlkirin.

Eger tarîfa Qanûna Bingehî li ser ``tirkbûnî`` wek esas bê qebûlkirin, ev tê wê manayê ku kesên ê ne hemwelatê Tirkîyê ne, nikarin bibin ``tirk``. Sedhezaran tirk li dewletên Ewropayê bûne hemwelatên van dewletan, divê ew êdî ne tirk bin û dewleta tirk jî wek tirk qebûl neke. Lê, dema ku sîyaset û pratîka dewleta tirk bê berçav, hertişt eşkere xûya dibe. Nasnameya resmî ya Tirkîyê etnîkî ye û bi vê şiklê jî îcra dibe. Kurd û gelên din jî mecbûr dibin ku bêjin ``em tirk in``. Ji vê mezintir jî nasnameya xwe dûrketin û derewkirin jî nabe. Bona vê, kurdan nasnameya tirk qebûl nekirin û ji vir ha jî qebûl nakin. Lê, bi mîlyonan kurd asîmîle bûn û jî nasname xwe ya netewî dest berdan.

Başbuğ di axaftina xwe da behsa ``asîmîlasyona kurdan`` kir û îdîayek anî ziman. Ev jî li ser ``ne asîmîlekirina`` kurdan bû. Kesekî vê gotînê bêje, divê yan ji dineyek din hatibe yan jî aqilê xwe winda kiribe. Eger dewlet asîmîlasyon li ser kurdan nekiriba, ewqas kurd zimanê dayîka xwe ji bîr bikirîya? Balê, çima perwerdehî bi tirkî dibe û ji bo kurdan kurdî di dibistanan, ûnîversîteyan, daîreyên resmî û medya da qedexe bû û hîn jî qedexeye? Rojnamevanek dîkarî di konferensê da pirsên xwe li Başbuğ bi kurdî bike? Şaredarên bajarên kurd dixwazin bi zimanê kurdî ji xizmeta bidin, pêşi li ber wan bi tehdît, mehkemekirin û ceza tê girtin. Başbuğ van tiştan baş dizane, lê rastîyên Tirkîyê û Kurdistana Bakûr li gora armanca xwe tevlihev dike.

Hinek babetên din di axaftina Başbuğ da hebûn ku divê mirov li ser van tiştan di nivîsek din da bisekine. Li ser PKKê, şerê li Kurdistanê gotinên şaş û vala ji dev Başbuğ derketin. Hemû ``tezên`` Başbuğ bi girêdayîya pirsgirêka kurd minak bi armancakê hatibûn nivîsî: înkar û asîmîlekirina nasnameya kurd û berdewamkirina şerê çekdarî. Bi rastî, Başbuğ bi xwe piranîya van îlmdaran wek Max Weber ne dizane, ne jî berhemên wan xwendîye. Mixabin, medya tirk ne va aspekt fam kir û ne jî pirsa vê kir. Bi gotinên vala wek ``nasnameya ser`` û ``nasnameya bin`` dîsa zeman qeyip bû û pirsgirêka kurd jî alîyê çareserkirinê di şûnê da ma.

www.arsivakurdi.org

Nebi Kesen doktora xwe ya lêkolînî ya ilmîya sîyasi di 3ê adara 2009an de wergirt



Li Enstîtuya Îlmî ya Sîyasetê ya Fakulteya Felstefê, li Universîteya Zûrihê ji Profesor Hanspeter Kriesi û Doçent Hans~Lukas Kieser bi merasimeka resmê de hat qebûl kirin. Titela wî: **Dr. phil. (Doktor der Philosophie, Doktorê Felsefe**) ye.

Babeta doktora xwe li ser Pirsgirêka Kurd di pêvajoya tewbûna Tirkîyê ya Yekîtîya Ewropayê ye.

Naveroka doktorayê bi kurtî ev çend noktayên li jêr in;

- Têkilîyên aborî û sîyasî yên YE û Tirkîye wek berendam
- Pirsên taybetî di pêvajoya danûstandinan da
- Pirsgirêka kurd di danûstandinên endametîyê da
- Tesirên îndîrekt yên nêzikbûna YE ya Tirkîyê li ser çareserkirina îhtilafî
- Di çareserkirina pirsgirêka kurd ya Tirkîyê tesîra direkt ya YE

Em wek redeksiyona Bîrnebûnê niviskar, alikarê kovarê û dostê hêja pîroz dikin û bi xebata wî ya bi salan têkoşî ku ev doktora xwe temam bike, bê westan hem karê xwe yê niviskarî û hem jî xwendina xwe berdewam kir. Em bi ev têkoşîna wî serbilind in! **/ Ali Çiftçi**

Öz gecmişî

Perwerde/tercuba kar(Egitim/İş Yaşamı)	
20.03.1963	Tarıxa ji dayık Resmi doğum tarihi (gerçek: 20.06.1962) Yeniceoba (Incov)
1969 – 1980	İlk- ve ortaokul, Lise /Yeniceoba
1980 – 1981	Almanya´ya geliş ve Almanca kursu
1982 – 1985	Ekonomi ve Siyaset Yüksek Okulu/Hamburg İktisat Bölümü
1985 – 1989	Köln Üniversitesi/ İktisat Bölümü ve Siyaset Bilimi
4/1994 - 10/1994	AKKO Treuhand-GmbH, Denetim ve Mali Müşavirlik Sirketi/Hamburg
11/1994 – 1/1995	Ralf Willmer, Mali Müsavir/Hamburg
2/1995 – 3/1996	P. Heimann, Avukat ve Mali Müşavir/Hamburg
4/1996 – 2/2002	GARANTAX Treuhand Mali Müsavirlik Sirketi, Büro Yöneticisi
1/2002	Mali Müşavirlik Devlet Sinavi/Hamburg
2002 yilindan beri	Mali Müşavir, Kesen Mali Müsavirlik Sirketi/Hamburg
2008	Uluslararasi Vergi Müşaviri/Hamburg
Mamostetêya pewerdê û docentî (Öğretim Görevliliği ve Docentlik)	
1990 – 1991	Docent, Hagen Acik Ögretim Üniversitesi/ Remscheid. Konu: Iktisat, Makroekonomi
ji 1991an vir ve	Docent, Seminarzentrum Göttingen GmbH, Göttingen Seminer Merkezi/Göttingen ve Berlin. Konular: İktisat, Türkiye Ekonomisi ve Siyasi Sistemi
6/1992 – 12/1993	Öğretim Görevlisi, Wuppertal Üniversitesi Ekonomi Fakültesi
ji 2002an vir ve/2002 yilindan beri	Docent, MUSER-STUDIEN (Privatinstitut für Steuer- und Wirtschaftsrecht), Vergi ve Ekonomi Hukuku Özel Enstitüsü/HamburgGfS (Gesellschaft zur Fortbildung im Steuerrecht) Vergi Hukuku Egitim Sirketi/Hamburg. Konular: Gelir ve Kurumlar Vergisi, Uluslararasi Vergi
ji 2006an vir ve/ 2006 yilindan beri	Docent, Private Fachhochschule Göttingen (Private University of Applied Sciences) Göttingen Özel Yüksek Okulu. Konular: İşletme Vergileri, Türkei Ekonomisi ve Siyasi Sistemi

Berhemên bi almanî, tirkî û kurdî/Yayinlar (Almanca, Türkçe ve Kürtçe):
Naveroka kitêp û makaleyên hatine çapkirin/ Kitap ve makalelerin konusu: Kürt sorunu, GAP, Türkiye'nin ekonomik ve politik durumu, Türk Vergi Hukuku, Türk Miras Hukuku, Uluslararasi vergilendirme, cifte vergilendirme, AB-Türkiye iliskileri ve Kürt Sorunu vb.

www.rsivakurd.org



Seîd Kirmizitoprak li gel malbata xwe li Anatoliya Navîn, li bajarokê Yunakê (1955)

Sûretek û çend gotin

Rohat Alakom

Pêwendî û têkiliyên kurdên ji deverên hev cihê hertim bala mirovan dikşîne. Dema ez berî çend salan çûbûm mala hevalekî, wî hevalî sûretek nîşanî min dabû. Di sûret de Dr. Şivan Kirmizitoprak, bi jina xwe û ligel zarokeke piçûk xuya dibû. Piştî çend salan, carekê ez çûme Îstenbolê, ez li wir rastî kurê Seîd Kirmizitoprak, Dara Kirmizitoprak hatim û me nasiya xwe da hevdu. Paşê min ew sûretê ku li bal min bû, min nîşanî wî de. Angorî Dara, ev sûret li Anatoliya Navîn, li bajarokê Yunakê hatibû kişandin, ew zaroka ku li ber wan e jî, xwîşka wî Rûken e.[1] Çawa ji çavkaniyekê jî tê xuyan Seîd Kirmizitoprak li Yunakê ehlîyeta xwe (îcazeya ajotina maşînan) wergirtiye.[2] Çend sal derbas bûn. Berî çend mehan min ji Dara Kirmizitoprak pirsî gelo ew di derbara mayîna malbata wan li Anatoliya Navîn de çi zane.

[1] Hevdudîtin ligel Dara Kırmızıtoprak , İstenbol, 13/5 2002.
[2] Mahmûd Lewendî, Bûyera Dr. Şivan û Seid Elçi, War, nr 7/1999, s.79-80.

www.arsivakurd.org

Dara, di bersîva xwe de malbata wî kîjan salan û li kîjan deverên Anatoliya Navîn maye, yek bi yek bi kronolojîk rêz kiribûn.[3] Wek li jêr jî xuya dibe, ew ji der Yunakê hin cîhên Anatoliya Navîn ên din jî maye:

Şibat 1962 - Gulan 1963 - Ankara (Gudul)
Gulan 1963 - Çile 1964 - Sivas (Gemerek)
Çile 1964 - Qanûn 1965 - Qonya (Yunak)
Qanûn 1965 -Qanûn 1969 - Isparta (Navend)

Angorî îfadeya Dara, dema bavê wî li van cîhan maye, wek mîsal li Ispartayê bi şênîyê (ahalî) Ispartayê re hine pirsgirêkên wî yên îdeolojîk hebûne, hin kesan bi hatina wî nerazîbûna xwe nîşan dane. Piştî Ispartayê, Seîd Kirmizitoprak tê Îstenbolê û paşê wek Dara dîyar dike, diçe tevî tekoşînî dibe.

Dema Seîd Kirmizitoprak li aliyê Qonyayê bûye, rojekê diçe bajarokê Quliyê, li wir hêzên neyar û paşverû li dijî wî derdikevin. Carekê tupekî pîknîkê yê hesin û giran ji jor de davêjin ku wî bikujin, lê belê ew bi tesadufî xelas dibe. Angorî M. Şirin Dağ, di van salan de pêwendiyên Seîd Kirmizitoprak ligel mirovên Anatoliya Navîn gelek baş bûye, ji aliyê kurdên van deveran de hatiye hez kirin, wek mîsal bandora wî li ser kesên mînanî nivîskar û rewşenbîr Osman Alabay hebûye.[4]

Seîd Kirmizitoprak (1935-1971) yek ji wan şexsiyetên kurd e ku piştî salên 1960yî di tevgera kurdên bakur de bi aktîvî cîh girtiye. Ew, yek ji wan 49 kesên ku di sala 1959an de hatibûn girtin û wek bi navê "**Koma 49an**" hatibû nasîn û wisa jî derbasî dîrokê bûye. Îsal çawa tê xuyan tam 50 sal di ser vî bûyerê, di ser girtina van kesên welatparêz re derbas bûye. Ev nivîs bi hinceta bîranîna 50 saliya Bûyera 49an hatiye nivîsîn.



Dara Kırmızıtoprak û Rohat Alakom
İstenbol, 2002

[3] Nameya Dara Kirmizitoprak a bi 14/1 2009 terîxî.
[4] Hevdudîtin ligel M. Şirin Dağ, Qulu. 19/5 2002

www.arsivakurdi.org

ÎSKEÎSKA BEXTA PÎNEKIRÎ

Xizan Şîlan

ez
li nav toz û dûmanê jiyana xopan
tawanbar hatim dinyaya
virek û gurî
li navbera parzemînên giyan
ba û bahozan nalenal e
erd û asîman lerizîn
dar û daristan rizîn
heyv û stêrk
di axîna çirûskên rêgeha xwe de
gevizîn
newal û robar qelişîn
çiya û kevir qefilîn
dem û demsal werimîn
mûyên serê temenê bêbext
rûçikîn
kaniya şerbeta eşq û hesretê
miçiqîn
awirên silavên roniya beyanan
di xezeba ewrên bixof de
perçiqîn
neynika evîna dilê xeşîm
şikest
şewqa çira odeya hestên şîrîn
vemirî
ramûsanên xunava lêvên şermok
kevz girtin
hêlîna beytikên gulîstana kesk
herifî
ji kezeba şevên tenêtiya kambax
firmêskên şewata nalînan
diniqutin
ji çem û lehiyên westiyayî
qêrînên xerîbiyê diherikin
aramiya biharên rengîn
li nav pêlên çarenûsa pûç
wer bûn
hêvî û xeyal
di konçala dewranên genî de
fetisîn
stûna koşk û serayên pişta ciwaniyê
telişî û hilweşî
hezkirin û bêrîkirin
li ber bareşa feleka xayin
têkçûn
roj
li tenîşta giyanê tevzînok
ketin xewa tiraliyê
şev
di kirasê xemgîniya kor û lal de
vediciniqe
li xewên şevistanan
siya tirsa xewnereşkên bixof
dipale ser qêrîn û hawara min
peşkên barana bextewariyê
li ser zeviya daxwazên perîşan
qet nebarî
xêrnexwezan

www.arsivakurdi.org

bîra êş û keserê
li ser qefesa xeyalên pişt xûz
kolandin
bêhna kulîlkên azadiyê
li hingurê asoya çolên ziwa
çilmisandin
giloka werîsê bextreşiyê
li stûyê şahiyên şevbihêrkan
alandin
mecnûnê çolistanên gerok
di zîndana rûreşiyê de
dîl girtin
derdora rêya fezîleta derûniya min
bi agirê talana têlstriyan
rapêçan
êşa dengvedena gewriya
şikeftên hinavê min
kes nabîhîze
êdî ez her şev
li nav baxê ramanên Manî
şereba dilovaniya Ahûramazda
vedixwim
kul û birîna sirên bîranînan
bi şeweta dengê bilûra keserkêşan
dikewînim
hevokên bedena helbesta tazî
bi keskesora asoya deryayê
dixemilînim
li nav reşbîniya hestên newêrek
zengilê dergehên xweşbîniyê
dihejînim
bi saya tembîhgotinên Hesenê Metê
ji nav pêlên tofana gunehkariyê
difilitim
û di hembêza xewa mirinê de
bi ferişteyên dojehê re
direqisim

2009-03-09, Stockholm

www.arsivakurdi.org

Ew kilama Memedê Îsê li ser birayê xwe yî ku li Îsveçê mirî gotiye.

EHSAN BIRA

Min nezanî, min nezanî Keko qurban min nezanî
Feleka xaîn kire navbera min û te axa sar e
Min birayê xwe anî vî welatî bi mêvanî
Min nezanî felekê xaîn taputî wi bi dest min de
min bişîne ji Almasê re
Hevalan ji min pirskirin gotin ka kekê te?
Min go ez kurbûm, min ew bîr kir bi xwe re neanî
Serê sibê ji min re anîn xebera reş
Keko ez şaşbûm min nezanî ku ez li welatê xelkê çi xeliyê bi serê xwe kim
Gotin, kekê te yî xwe dirêş kiriye bêxwedanî
Xelkê xêra xwe ew ji erdê helnayê
Bes e were bes e were
Min hîng herdû bira xwe ji bîr nekirine
Te yî xwe da serê
Min go Almas xungê ez vê aciyê hetanî axiretê ji bîr nakim
Hetanî ku ez nerim herdê delal etkê xwe wo
Ez çûm ber deriyê nexweşxanê, gotin delalê dilê te
Tabur kirin, rapor dane
Gava ku min ew xebera bîsto ez bi çoga ketim erdê
Min hawara xwe kir Hikmet e
Min go were malê kin şewtando, ez î çi bikime malî dinê
Keko eger bi pera bihata sandin min ê bida malê dinê
Eger ew jî nebûya min ê bida canî xwe ber kêrê

www.arsivakurdi.org

Gava ku doxtor derî vekir
Min dî kekê min î bi dev rûya ketiyê erdê
Min xwe avêt herdu niga
Hikmet xwe avête ser qefesê pano
Min go bes e were bes e wer
Min bîr nekiriye Resoyê sorî, te yî xwe da sere
Min go Almas bavê Elîfê meleqîne
Bavî Elîfê yî li ba min pir bi qîmet e
Dilê kekî min sekiniye
Ne birayek ne jî xwangek li kêleka bavê min hebûye
Ku hawara xwe te kira
Wexta ku taputê kekî min danê ber malê
Min go Hikmet were ez î çi bikime malî dinê
Min wenda kiriye kekê xwe wo
Almasê got; heqsiz, ez bi te re deng nakim
berî xwe berve malê te nakim
Te kincê delalî min anîn li ber min velo kirin

Ew êdî ji bo min bûne yek qerpal e
Ez a wan belav bikim li fiqaran e
Kincê kekî min kirin çalan e
Belav kirin li fiqaran e
Ere bira ere bira
Hevalno ji ku kekê min gêr bûye
Min berdaye îş û kar e
Lê ez çi bikim dîsa nebûm tucar e
Bes e were bes e were
Min hîn bîr nekiriye birîna du birayê
Vêcarê te yî xwe daye serê
Keko wexta ku tu ji min qetyayî
Min dost û bira hing rind nas kirin
Bes e were bes e vê birînê min tijî xwîn neke

www.arsivakurdi.org

Keko min go tu here têr rakeve,
Ma çavê kekî min li dûv xwe nemînin
Ez ê komê kekî xwe bi hêlê xwe dim
Him bi xwe re bi ortax, him bi bira
Hikmet keko xas bi te
Malê te ji malê kekî min a firk e
Tu nabînî şûnê ku kekî min lê gêr bûyî
Keko ez ê şûnê ku tu lê gêrbûyî darkim
Herim warim bi hestirkê çavê xwe avkim
Almas, Kekî min î pir narîn e
Ez ê hestirkên wî paş kim bi destmalê îpek e
Hevalno birînê min ê pira giran e
Min wenda kiriye kekê xwe li 51an e.
Keko ez te bîr nakim hetanî axretê

Memedê Îsê (Mahmut Tiftikci)

CD yeka nu ji Xortên Qerejdaxê bi kilamên folklorîk yên ji Anatoliyê

- Cindî
- Tu gul î
- Îbram
- Tew tew
- Dînê te me
- Mere
- Çavreş
- Lê keçê



www.arsivakurdi.org

XÊRA MIRIYAN

Mem Xelikan

Dema xebera mirina Gulê hat, meha sibatê bû. Rojeke sar, her der berf û çamûr(herî) bû. Ji kûtigên berfê ciranek ne diçû cîranekî. Her derek cemidî bû. Rîya gundê ku diçû qezê di bin berfê de mabû.

Ji bo meytê Gulê ji qezê bînin gund, pîqaba Salo amede kirin. Zencîr avêtin tekera. Tabûtê boş avitin ser tênte.

Çend xortan ji mala Salo de hetanî rîya ku dikeve ser rîya qezê, bi bêran rê vekirin.

Salo û du kesên din li erebê siwar bûn û bi rê ketin.

Meço li dawiya gund li ser rê li benda wesîtekê bû.

Dema ku Salo Meço dît, erebe dawestand.

Meço:

– Salo qurban, dizanî lawê min esker e! Va sê mehe ne ku me jê tu xeber û name negirtin!

Îro ne roja xwe ye, dizanim. Lê ku tu misade bikî, dixwazim bi we re herim qezê, ji PTTê pirs kim ka tu xeber hene an na.

Salo:

–Welle, li pêşîyê tu diwînî, cih tuneye. Eger tu dixwazî, li vê sermê, li paşiya erebê rêwîtîyê bikî, were.

Meço:

– Xwedê ji te razî be! Min xwe qêm pêçaye. Ez dê li paşiyê erebê îdare bikim.

Meço li erebê siwar bû û xwe da ser têbût.

Erebe, bi şiqeşiqa zencîra berf diqelaşt û hêdi hêdi bi rê diçû. Meço ji bo ku xwe germ bike herdu destên xwe rahev dixist. Cixarek ji berîka xwe derxist û vêxist. Kûr û kûr kişande hundirê xwe.

Lê xuya dikir ku va serma zivistana romê kolay derbas nabe. Meço, çiqas xwe vir da û wir da dilivand jî, diqefilî û dicirifî. Fikrek hate bîra wî.

Bi xwe û xwe got:

– Ez bikevim hundirê têbût ê min ji sarmayê biparêze. Deriyê têpût ji hev kir û kete hundir. Derî li ser xwe girt û xwe tê de dirêj kir.

Salo û ew herdu kesên ku li pêşîyê rûnştîbûn hêdî hêdî bi rîya xwe de diçûn û sohbeta serpêhatiyên rîya dikirin.

Demekê bi şûnda ketin nava gundekî li ser rê. Rêwîyekî dest heyna û erebe dawestî.

Rêwî:

– Pismam, xêra miriyên we, ez jî bi were hetanî qezê herim.

Salo gotina ku ji Meço re goti bû jî wî re jî got:

– Hilkişe ser tênte.

Rêwî hilkişiya ser tênte û xwe da ser

www.arsivakurdi.org

têbût. Erebe bi rê ket. Rêwî hay ji Meço tunebû.

15-20 deqa bi şûnda Meço di hundirê têbût de xwe livand û got:

– Em hîn di qezê negêhiştinî?

Dema rêwî ji têpût ew denga bihîst, ji ser têbût de firîya û xwe ji erebê de avite erdê.

Bi ser wan dengana de, Salo erebe dawestand.

Salo:

– Meço we çikir? Te li mêrikî mîvan xist?

Meço:

– Na! Na! Kîjan mêrik, nizanim çi bû?

Salo li însanê ku li erdê di nav berfê de dernexûn dirêjbûyî, nêrî.

Dest û pîyên wî livandîn, lê mêrik ne li xwe bû. Guhê xwe da ser dilê wî, tu deng jê nedihat. Dilê wî dawestîbû.

Salo çexê Meço bû:

– Lo, te dît te li me çi kir? Te mêrikê xelkê kuşt." Çend deqan bi şunda hatin xwe.

Li çareseriyekê gerîyan.

Salo û hevalên xwe meytê wî rêwîyî kirin têbût û çûn qezê.

Li ser vê bûyerê serê Salo û Meço pir hat êşandin. Bi salan çûyîn û hatina mehkeman bi şûnda ji Salo re salek û ji Meço re jî dû sal, cezayê hepsê hate dayîn.

Şevbider im



Mem Xelikan, yek ji wan şaîrên kurdên Anatoliya navîn e ku ji zû ve ye nivîs û helbestên xwe bi zimanê kurdî dinivisîne. *Şevbider im,* kitêba wî ya pêşîn e ku helbestên xwe tê de ber hev kirine.

Di helbestên Mem Xelikan de meriv bi hîsên gotinan, bi hukmê gotinan, bi îzet-î nefsa gotinan, bi pîrozî û bi sadiqîya gotinan dihesin.

Mem Xelikan yek ji wan nivîskarê ehl-î gotinên xwe ye ku helbestên xwe ji kurahîya dilê xwe derdixe û bi wan re dijî. Û ev yek jî dihêle ku gotin bibe xwedîyê stîleke xas, hunereke tîr û têr, bibe kubarîyeke edebî: helbest.



Weşanxana Apecê

www.arsivakurdi.org

Lİ SER ŞÊXBİZİNÊN HAYMANEYÊ Û KOKA NAVÊ WAN

Nuh Ateş

Kurd li Anatolîyayê li ser herdêkî mezin bi cî û war in. Lê ku meriv mêla xwe bide nava Anatolîyayê, xwesma dorberê paytexta Tirkîye, Enqereyê û deşta Konyayê dê bibîne ku 3 navend li wê derê hene, te bibejî mohra Kurdan li ser e: Haymane, Cihanbegli (Hespîkêşan, Înevî), Çîçekdagi (Mecîdîye, Çîçek). Haymane qezaya Enqere ye, Cîhanbeglî ya Konya ye û Çîçekdagi jî ya Kirşehîrê ye. Ku navê van her sê qezayan tê heldan, li ba Tirkan jî hema Kurd tên bîr û berçavên wan.

Ji van her sê navendan ya kevntir û navdartir Haymane ye. Ji sê eşirêtên mezin yên li van navandana yek jî eşîra Şêxbizinî ye. Piranîya Kurdên Haymaneyê Şexbizinî ne. Şexbizin navê eşîreteke (Konferderasyoneke) mezin û kevn e. Ew ê di pey barkirin û rêwîtîyeke dûrûdirêj va hatiye li nava Anatolîyayê êwrîye û li wir hatiye bicihkirin.

Her çiqas li ba Kurdên Anatolîyayê tevgêra eşîrtîyê ji hev de ketibe û teybet û rabûn û rûniştinên eşîrtîyê hatibin bicihîştin û gûhêrtin jî navên wan man e û ew di navxwe da hîn bi navê eşîrê tên heldan û naskirin.

Heta niha di kovara Birnebûnê da di pir nivîsên ji hev cihê da hayadarî li ser Şêxbizînan hatin belavkirin. Helbet hîn pirs û mijarên ku li ser lêkolin çêbibin hene, nimûne, li ser nav, tarîx, ziman û foklora Şêxbizinan.

Bi vê nivîsê merema min ew e ku çavkanîyên li ser Şêxbizinên Haymaneyê û xizmên wan yên Li Kurdistanê û cihên din bidim naskirin û çend nimuneyan ji navaroka van pêşkêş bikim. Ji vê wê da jî pirtir dixwazim ditin û mitaleyên ku di heqê navê Şêxbizîn da hatine belavkirin bidim ber hev û hur li wan binêrim û hen tiştên nû bidim ser. Lê berê gerek e ku sewa xwandevanên xerîb yên ku hay jê Şêxbizinên Haymaneyê nene çend malumatên pêşkêş bikim.

Şêxbizinên Haymaneyê

Nehîye û gundên Şêxbizinan:

Ji 86 gund û nahîyeyên Haymaneyê 52 Kurd in yan jî Kurd lê dijinin. Û li 33 yên ji vana Şêxbizin lê dijinin.

www.arsivakurdi.org

Gundekî Şêxbîzînî bi ser Polatliyê û 4 gundên Şexbizînîyan jî bi ser Kuluyê va ne [1]. Nahîya mezin ya Şêxbizinî Yenice (Gozgoz, Sindiran) ye û navê wê yê kevn Şeyhbizinli bû. [2]

Hejmara gund û nahîyayên Kurdan bi ser Haymaneyê va berê, hetanî çaryekê sedsala bîstan yê pêşî hîn pir bûn. Hen jî wana di pey guhêrtinên îdarî va bi ser qezayên Polatli, Bala, Gölbaşi (Enqere) û Kuluyê (Konya) va hatine berdan [3].

Hejmara Kurdên Şexbizinî li Haymane û derdora wê bi tehmîn kêmtir di ser 20 hezarî ra ye [4].

Kanên debarîyê, Jîyana sosyal û rabûn û rûniştinên civatî: Mîna Kurdên din yên li nava Anatolîyayê, li ba Şêxbizinan jî binyada dewlemendî û debarîyê, di destpêkê da xwedîkirina pêz û têcirîya berên wê, goşt, herî, rûn û penêr bû. Di dûy va wan dest avêtin çandinîyê, pirtir jî rişandina genim, cêh, nîsk û kuşne. Lê ji salên 1950/60 î pê da, ji ber xerawbûna şert û îmkanên cotkarî û çandinîyê, pir ji wana sewa xewn û omdîya debarîyeke baş, pez, zevî û gund bicihîştin û barkirin çûn navanda Enqere û qezayên wê. Di serî da, wan li wir debara xwe bi paletîya di bazarxaneya Enqereyê ya sebze da dikirin. Hen ji wan hîro li wir xwedanê kar û kargehên xwe ne. Ji Şêxbizinan henan jî berê xwe dana welatên Ewrupayê, Elmanya, Awisturîya û Danemerqa [5]. Çavkanîyeke kevn li ser kurdên Haymaneyê Geoge Perrot yê frensî ye. Ew di sala 1861 an da çûye Haymaneyê û li gundên Kurdan jî gerîyaye û li ser jîyan, debarî û rabûn û rûniştinên wan yên hîngê nivîsandîye. Di hen cihên nivîsên xwe da wer dibê:

"Kurdên Haymaneyê ji demeke dûrûdirêj ve ev gava dawîn ji jiyana koçberîyê ber bi jiyana dêmanîyê û xwecihiyê avêtine. Wan ji xwe re xanî avakirine, lêbelê ew hêna herdem xwedîye konên xwe ne. Li tevayiya Anadolê, pir kêm eku mirov hemû serdemên salê li bin zikê xaniyekî bibihurîne. Piranîya gundên deştê havînan diçin havîngehan, di nava çîyan da li qonaxa deh an panzdeh saetan,ew diçin yayla....

Ew tenê ji bo xwarina xwe hinek cêh û genim diçinin. ..... Bi rastî hesp, pez û dewarên ku ew xwedî dikin dewlemandîya wan e. Ew dewarên xwe li Îstenbolê, li Îzmîrê, li Trabzonê difiroşin. Keriyên ku ew li ber xwe ji Haymanayê ta Konstantinoplê bêrawestan dajon, nêzikî çel rojî bi rê va dimînin ....

Ez paşê li gundên din bêtir matmayî mam gava min dît ku jinên rûvekirî dihatin beşdarî civaka me dibûn. Wekî ku di axaftineke giştî de jingundîyên me li Fransayê dikin, jinên kurd jî di nava mêran de, li mala ku em lê bûn rûdiniştin....

Desthilatîya tirk bi nermî bi Kurdan re dide û distîne. Ji aliyê bacê û

www.arsivakurdi.org

leşkergiriye, ew di rêya serokên wan an begên wan karê xwe encam dide û tucarî daxwaz û niyazmendiyên xwe bi xurtî najo ser wan.....

Li Angorayê, navûdengê Kurdan derketiye ku ew ji dizîtiya xwe ne têr dibin, ne jî dixwestin û xuya ye ku ev navûdeng ne biderewan li wan hatiye kirin.....Bi wî dilê saf û sade ku Odiseyos, qehremanê kiteba Homeros, pesnê dizîtiya xwe ya dervayî dike, Kurd jî bi wî dilê saf pesnê dizî û rêbirrîya xwe dikin..." [6].

Çavkanîyeke din ya biyanî Mark Sykes yê îngliz e. Ew ji di sedsala 19 an da li nav Kurmancan û li Kurdistanê gerîyaye. Di berhema xwe ya li ser eşîrên kurmancan da cih daye Şêxbizinan û hen meziyet û teybetên Şêxbizinên li Kurdistana İraqê yên wê demê heldide. Ew î wer dibê:

"4000 mal in. Eşîreke mezin û şerxwaz e, hêrişkar û bejî ye. Bi dizîya xwe tê naskirin. Siwarîyên bê hemsal in. Weqas bi heş in ku sileha Martînî ya Henry bixwe çêdikin. Zivistanê li gundan û biharê li kêleka gundan di konan da dijinin. Li meha hezîranê, ji helnana ber bi şûn da bi keriyên xwe va berbi hudûdê Ecem dikişin û li Îlonê yan jî ku pir germ dibe hîn dereng vedigerin...." [7].

Guman heye ku ji awayê bilêvkirinê hen dîtin û gotinên Perrot û Sykes, xwesma yên di derheqa dizîtî û şerkarîyê da, wekî pêşhukim bên fehmkirin. Ji bîr nekin ku şan û şeref, avakarî û şerkarî, wêrekî û tirsekî, jîrekî û dizekî, meziyet û teybetîyên han li gorê dem û şertan kêm û zêde li ba her xelkekî hene.

Ya rast ew e ku ji nav Şêxbizinan cihêmêr yan mêrxasên binavûdeng derketine. Bi tirkî ji wana ra "kabadayi" tê gotin. Kurmancê Enqereyê Ahmet Turgut yê ku bi naznavê bi tirkî "Kürt Ahmet" nas û navder e yek ji wan e û hîro xwedîye pir kargeha ye. Ew bi eslê xwe kurdê şêxbizinî ye û ji Haymane/ Yenice ye. Di ber wî jî mêrxasê Enqere yê rehmetî, Cemal Coşar yê kû bi naznavê "Kürt Cemalî" navdar bû, bi eslê xwe Kurdê Şêxbizin e û ji Bayburt/ Gümüşhanê ye. Ew di sala 1962 an da, bi destê cihêmerê tirk yê ku bi navê Dundar Kiliç nas e, hatibû kûjtin [8]. Teybetiyeke kesên han ew e ku ji xizan, xerîb û bêkesan ra destfereh û xêrxwaz in. Lewma ew nas û navdar in û rewayî naznavê cihêmêr yan mêrxas tên dîtin. Di nav meşhorên Şêxbizinan da, di hen çavkanîyan da navên wekî Bedrettin Dalan (serdarê kevn yê bajarê Stembolê), Selahattin Duman (rojnamevan) Bülent Ulusu (Serokwezirê Tirkîye yê kevn) tên heldan [9]. Rast e ew e meşhor in, lê ji hêla xwaztin û parêztina heq û hukukên Kurdan yên milî û kulturî da bê xêr û bê kêr in. Şêxbizinên ku sewa heq û daxwazên Kurdan bi xîret kar û xebat dikin û kirine jî hene. Nimune, şexsîyetên wekî

www.arsivakurd.org

Hatice Yaşar, Şevki Özkan, Mehmet Özkok û Vahit Başaran yê mirî [10]. Ji aliyê bawerîyên olî da Şêxbizinên Haymaneyê muslimanê şafî û çend komên xwe jî henefî ne.

Eşîr û qebîleyên Şêxbizinî: Cuînet eşîra Şêxbizinî li ser van bavikan parve dike: Xorasanî, Hevedanî, Herfodanî, Jîrdikîyanî, Lêranî û Nosalanî [11]. Wî "li" ya tirkî pê paşiya navên eşiran va kiriye û ew, nimune wekî "Herfodanlı", "Lêranli" binavkirine. Ji vê binavkirinê meriv têdigihê ku dev û çavkanîyên ku wi malumet li ser vê mijarê jê wergirtine tirkî/osmanî bûne. Lewendî ji devê Demîr, kurdekî Şêxbizinî li Parîsê navê du eşîrên mezin yên Şêxbizinîyên Haymaneyê neqil dike: Hesenî û Silênî (Silêdnî) [12]. H. İ. Uçak li gor gotinên kurdên Şêxbizin yên Hamaneyê Şêxbizinîyên Haymanayê li ser du tayfeyan parva dike: Palanî û Kerkukî [13]. Uçak bixwe kurdê Haymaneyê ye û qasî ku ez pê dizanim, yekem kurdê wê heremê ye ku li ser Haymaneyê û Kurdên wê derê lekolîn kiriye. Lê çi heyf e ku wî di kîteba xwe da nexwaztiye yan newêrîye ku navê eşîrên Kurd li Anatolîyayê bi nasnameya kurdî bilêvbike û qala ziman û kultura wan ya resen bike. Li vir, dixwazim bibîrbînim ku di cedwelê eşîrên Kurdên Kurdistana İraqê da navê Şêxbizinîyan wekî eşîr bi awayê *Şêx Bizeynî* li navçeya Xanekîn û Kerkuk



"Gavurkale" li Heymaneyê ji dema Hîtîta de maye

û navê Palanî jî wekî eşîreke li navçeya Xanekîn derbas dibe [14].

Şêxbizinî kingê û ji ku derê hatine Haymaneyê û li wir bicihbûne? Bersiva pirs û mijarên han hîn bi awayekî zelal nehatiye kifşkirin. Di navbera hayadarîyên di çavkanîyên ji hev cihê da li ser vê mijarê lihevnehatî heye. Hütteroth dibê, Kurdên Şêxbizinî ji wî ra gotine, ew di salên 1800 û 1810 an da li Haymaneye bi cî û war bûne [15]. Niviskar û sîyasetvan Hatîce Yaşar, bixwe kurdekî Şêxbizinî ye, dibê, Şêxbizinî di dema hukimdarîya Abdulhemîd da li Haymaneyê hatine bicikirin [16]. Li gorê hen çavkanîyan jî Şexbizinî di sala 1514 an da hatine li haymaneyê bi ci û war bûne [17]. Ez dirêj nekim, li gorê çavkanîyên di destê min da Şêxbizinî 200 yan 300 salî yan jî 500 salî di ber vê li Haymaneyê bi cih bûne yan hatine bicihkirin. Li gorê agahdarîyên ku M. Sykes dide, Yavuz Selîm ew ê ji Kurdistana İraqê (Kerkuk/Xaneqîn) ajotine nava Anatolîyayê [18]. Li ser pirsa Şêxbizin ji ku derê hatine Haymaneyê

www.arsivakurdi.org

jî dîtinên ji hev cihê tên pêşkêşkirin, yanê lihevnehatî heye. Hen kes dibên ji Kerkukê û Paluyê (Elezîz), hen jî dibên ji Bedlîs û Sêrtê hatine. [19].

Zarawayê Şêxbizinî: Şêxbizinî li gundên Haymaneyê û li navenda Haymane û Enqereyê tê dengkirin. Lê wî ji bend û derbên asîmîlayonê çiqas zîyan dîtîye û hîro di çi halî da ye em pê nizanin, li ser vê mijarê di dest me da tu lêkolîn tunin. Ji alîyê zarawanasîyê da li ser şêxbizinîya Haymaneyê nivîs û lêkolin pir kêm in. Mehmet Özkök di nivîse xwe ya ku min li jor qalkirî da li ser zarawayê Şêxbizinî dawestîye. Mahmûd Lewendî pirtir serê xwe bi zarawayê şêxbizinî ra êşandîye û hur û kur li teybetîyên vî zarawayî nihêrîye [20]. Ew di vê lêkolîna xwe da zarawayê şêxbizinî bi zarawayên din ên zimanê kurdî va dide ber hev û li dawîye digehe wê encamê ku zarawayê şêxbizinî ji zarawayê kurmancî, hewramî-goranî û dimilî bêtir nêzikî zarawayê soranî/mukrî, erdalanî, lurrî/beyreyî (feylî) ye. Lê jî hêla tawandina fiîlan û bi karanîna zamîran da ew î nêzikî soranî ye. Ji alîyê peyvan va jî pirtir nêzikî feylî/lurrî ye [21]. Di eslê xwe da erdalanî û mukrî ji jêrzarawayên kurdîya başûr (soranî) in. Erdalanî li Senendejê (Îran), mukrî li Mahabad û Bukan (Îran) tê dengkirin [22]. Li ser zarawayê lorî/feylî (jê ra Lurî jî tê gotin) dîtinên ji hev cihê tên pêşkêşkirin. Hen çavkanî lorî di nav kurdî da heldidin û hen jî wî bi ser



Nexşeya ku cih û warên Şêxbizinan nişan dide

www.arsivakurdi.org



Xiraweyek li gundê Boxazköyê

farisî da dihesibînin [23]. Welatê Loran, Lorîstan li ser herdê Îranê ye. Feylî (Pehla) jî berek ji Lora ye û li İraqê dijinin û xwe Kurd dizanin. Li wir, cihê bibîranîyê ye ku li gorê Şerefnameyê Şêxbizinî bi eslê xwe digêhin Kurdên Lak (Lakî, Lekî) [24]. Îzady zarawayê lakî teve zarawayên goranî yên bingehî, hewramî, kirmanşahî û kelhorî heldide û goranî û dimilî jî digêhine pehlewanî. Goranî/Hewramî di wexta xwe da zimanê Qiraltîya Kurd ya Erdalanî bû û li herêmên wekî Merîvan, Hemedan, Kirmanşah, Xaneqîn û Mandelîyê zarawayê serdest e. Senendej (Sine) paytexta Qiraltîya Erdalanî bû. Neslê Mirên Erdalan digêhe Fermanrewayên Dîyarbekirê, Merwanîyan [25]. Îzady dibê, lakî pir di bin tesîra lorî da maye û hîro li herêma Îlam (Êlam), Gelan û Pahla (Îran) û li navberê Semsur û Ceyhanê û li herêma Edeneyê jî tê dengkirin [26]

Cih û war û xizmên Şêxbizinan

Kurdên Şêxbizinî, ji Haymaneyê (Tirkîyê) bigre hetanî Xaneqînê (İraq) û ji wê jî hetanî Îlamê (Îran) li coxrafyake pir fereh belav bûne. Mezinahîya vê kevneşîrê bi ferehîya herdê ku ew li ser va lihevhati ye. Ci û warên ku Şêxbizinî hîro lê dijinin bi yekbiyek heldanê teva nabin. Navên wan di desteenexşa li jêr da hatine nîşankirin [27].

Destenexşa Lewendî jî bi me dimêrîne ku koma Şêxbizinan pir mezin e û li coxrafyake fereh belav bûye. Lê ku kom mezin bû, ciran, xizm û mervatî ji pir dibin. Vê cara jî ji nav derketin û ji hev derxistina wan çetin dibe. Ji hayadarîyên li ser ziman û zarawayan derdikeve pêş ku di navbera Şêxbizinan û Kurdên Lor, Lak, Soran/Mukrî, Goran, Hewraman, Kelhor, Erdalan da xizmtî û merivetîyeke nêzik heye. Va jî di lêgerîna li nav, nasnameya û kevnewarên Şêxbizinan da şop û nîşaneke bi kêr e. Nêziktîyeke weng di navbera wan da ji alîyê cografyayê de jî heye. Ji nexşeyan wer xuya dike ku herd û herêmên ku ew li İraq û Îranê lê dijinin bi ser hev va ne. Ji ber jî ji gumanan ne dûr e ku ji hêl û mêla êşîrtî û ejdadî da jî nêziktîyek di navbera wan da heye.

Navên ku pê Şêxbizinan va hatine kirin û bingeha wan

Ciranên Şêxbizinan yên Kurmanc wan pirtir bi navê Şêxbizin nas dikin. Kurdekî Şêxbizinî, bi navê Şewqî dibê, em li ba xelkê xerîb xwe bi navê Kurd û zimanê xwe jî bi navê kurdî didin naskirin. Ew dide ser û dibê, lê li ba Kurmancên cîran em ji xwe ra dibên, Şêxbizin û ji zimanê xwe ra jî dibên, şêxbizinî [28]. Balkêş e ku navê bi awayê Şêxbizin yan Şêxbizinî tenê yan pirtir li Tirkîyê û Kurdistana Tirkîyê derbas dibe. Di Şerefnameyê (wergera tirkî: M. Emin Bozarslan) da bi du awaya, *Şêxbizinî* û *Şêxbizeynî*, lê di wergera kurmancî (weşana apek) da bi awayê *Şêxbizinî* derbas dibe [29]. Di destnivîsên Şerefxan da wer hatiye nivîsandin yan ji wergevana wer nivisîne, em pê nizanin. Bi heldana Lewendî, Kurdên Iraq û Îranê navê *Şêx Bizenî* û *Şêx Bizênî* bikar tînin. Ew dide ser dibê, navê Şêxbizinî di eslê xwe da ji *Şah Basnî* yê tê [30]. Îzady awayê *Bazaynî, Bezanî* û *Bezeynî* bikar anîye [31]. Dr. Mikaîlî dibê, ji wan ra *Şixbizin*/*Şeyhbizinli* tê gotin û Kurdên herêmê wan wekî *Şaxzînîya* jî bi nav dikin û ya rast jî va ye. Bi dîtina wî cih û warê esas yê ku Şêxbizin jê hatine Xaneqîn û dorberê we ye. Li wir ew, bi gotina wî, bi navên *Şêxzînî*/*Şeyh Bezenî* tên nasîn. Binyada vî navî jî, li gorê ku Dr. Mikaîlî helnaye, digihînin navê *Şeyh Huseynî.* Di çerxa zemên da, ew hatiye guhêrin û bûye *Şêxzînî* [32].

Hen kes û çavkanî jî navê Şêxbizin digihînin navê herêma *Bazan*/*Bazeyan*/*Bazîyan* û gotinên *Bazin* û *Bizin* [33].

www.arsivakurdi.org

Aşkere ye ku li ser koka navê Şêxbizin û awayê bilêvkirina wî dîtin û mitaleyên ji hev cihê hene. Hen ji wan, xwesma yên ku koka navê Şêxbizin digihînin gotina *bizin* û *bazin*, bi merivan va mîna lihevanîyan tên. Hen jî ji cihêta mêrandina delîl û çavkaniyan da sist in. Lê hemahema gîştên wan li ser girêdana navê Şêxbizin bi herêma Bazeyn ya li Kurdistana İraqê va hemfikir in. Bi heldana Şemseddîn Samî herêmeke (qesebayeke) bi navê *Bazyan* heye û ew 30 kîlometrî li bakûrê rojavayê Sancaxa Silêmanîyê dikeve [34]. Di cedwelê eşîran yê ku Îzady amadekirî da, warê eşîra *Bezeynî (*yan *Şeyh Bezeynî)* li eynê herêmê, li navbera Erbîl û Kerkukê hatiye nîşandan [35]. Gumaneke ji aqilan ne dûr e ku wê herêmê/qesebayê navê xwe ji eşîra Bezeynî yan Bazyan helnaye.

Bazyan, Bazeyan, Bazîyan, Bazeynî, Bezeynî, Bizeynî, Bizêynî, Bizênî...

Mimkun e ku koka van navan gîştan yek be û ew jî Baz be û ji Baz jî Bazî> Bazyan>Bazîyan>Bezeyn>Bazeynî>Bezeynî> Bizeynî>Bizênî peyda bûye. Di pir çavkanîyan da meriv raste navê Baz tê. Di çavkanîyên erebî da navê Badh/Bath Baz derbas dibe. Îzady dibê, wextekê (bi tehmîn salên 1200-1300 î da) li rojavayê Azerbacanê û çîyayên Sabalanê eşîreke Kurd bi navê Badh bi cih û war bûye û ew eşîra hîro bi navê Baz û Bazaynî dijine. Vê eşîrê di wexta xwe da navê xwe li qesebaya Badh kiriye [36]. Qesebaya Badh paytexta peşrewayê tevgêra huremîyê, Babek bû. Navenda serheldana Babek (816) li Azerbaycanê keleya Baz bû [37]. Yekî ji eşîra Badh di sala 983 an da, li Ahlatê (Xelat) li bakûrê gola Wanê û derdora wê xanedanîyekê ava kiriye. Paşê va xanedanîye mezin bûye û li ser hîmên wê dewleta Merwanî (983-1085) hatiya venan. Îzady dibê, eşîra ku xanedanîya Badh jê peyda bûye, hîro li Kurdistana Başûr û Kurdistan Rojava bi navê Baz û Bazaynî dijine [38].

Şopeke li ser navê Baz dihere digêhe eşîra Kelhor. Kelhor eşîreke mezin û navdar e û li ser herdê Zohabê (Îran) hetanî Mendelîyê (İraq) dijine. Hêlek ji wan li Erdalanê ye. Celîlê Celîl ji Lerch heldine dibê, Kelhor ji du serîyan peyda dibin: *Şahbazî* û Mansurî û dide ser dibe, Kelhor bixwe tevê Goranê Lak dihatin navkirin [39]. Di çavkanîyeke din da navê *Şahbaz* wekî *Şabaz* derbas dibe. M. Emîn Zekî ji Rawilson heldine dibê: "*Eşîreta Kelhurê gelek kevnare ye. Hejmara wan 20 hezar malan zêdetir e. Nîvê wan di nav Îranê da û nîvê wana ê din jî li çîyayê Zagrosê li cîyê wan ê berê ye dijîn. Ev jî du qebîle ne: Yekemîn Şabazî ne û nêzikî 8 hezar mal in, li Kirmanşan, Mahîdeşt û Mendel dimînin.."*[40]. *Şahbaz*, *Şabaz* mimkun e ku di eslê xwe da Şah Baz be. Eger wer be, hîngê meriv dikane wekî gumaneke din pêşkêş

www.arsivakurdi.org

bike ku Şah Baz di çerxa zemên da hatiye gûherîn bûye Şêxbizin, Şah bûye, Şêx û Baz jî bûye Bizin: Şah Baz>Şah Bazî>Şah Bazîyan> Şeh Bezîyan> Şeh Bezeyn>Şeh Bizeyn>Şêx Bizin. Şêx navek e lê naznavekî olî û civati ye jî. Kurdê Şêxbizinî, Şewqî dibê, li ba Şêxbizinan Şêx tune, mele heye. Ku wer be, hîngê va jî gumana ku pêşnavê Şêxbizin, Şêx ji Şah peyda bûye piştrast dike. Şopeke li ser navê Baz digihê dem û dewrana Babîlonyayê. Di çavkanîyekê da qala xanedanîyeke bi navê Bazî tê kirin.Tê gotin ku ji Xanedanîya Bazî 3 qiralan li Babîlonyayê di pêy hukumdarîya Xanedanîya Deryayî û berî hukumdarîya Xanedanîya Elaman hukumdarî kiriye [41].

Berî Elaman hukumdarîya Babîlon–yayê di destê xelkê entîq Kasîyan (Kasu, Kassît) da bu û wan 400 salî hukumdarîya babîlonyayê kiribûn. Hîngê mimkun e ku Bazî berek ji xelkê Kasî ne. Li gorê hen çavkanîyan, di strandina hevîrê ku xelkê Kurd ji çebûyî da Kasî jî xwedî par in [42].

Elmanya, Mainz, 04. 03. 2009

Jêrenot: Kîteba Şoreş Reşi ya li ser navê, "Dîroka Kurdên Koçber" I û II, Çavkanîyeke li ser Şêxbizinîyan e jî . Mixabin ev dereng, ku min nivîsa xwe xelas kir bi şûn da, kete destê min. Lewma dixwazim bi vê jêrenotê mêla xwendevanan bikşînim ser vê çavkanîyê.

Çavkanî

[1] Mehmet Özkök, Haymana Şeyhbizinlari üzerine, Bîrnebûn Hejmar. 4, r. 14 û Mahmûd Lewendî, Kurdên Şêxbizinî, Bîrnebûn 3, r. 81, M. Şîrîn Dag, Kulu Kürtlerî, Bîrnebûn 3, r. 23 û Dr. Mîkaîlî, Îki Kitap, Bîrnebûn 37, r.55-56

[2] Enver Yurtdaş, Hamdî Çeker, Faîk Coşkun, Dünden Bugüne Yenîce ve Şeyhbizinlar, ISBN 975-288-525, r.9

[3] Çavkanîya berî vê, r. 11.12

[4] Nuha Ateş, Îç Anadolu Kürtlerî, weşana Komkar, 1992, r. 48-54, Rohat Alakom, Orta Anadolu Kürtleri Litertürüne Bir Katki, Bîrnebûn 8, r. 69

[5] Mehmet Özkök, Haymana Şeyhbizinlari üzerîne, Birnebûn 4, r. 16, 19 û Enver Yurtdaş, Hamdî Çeker, Faîk Coşkun, Dünden Bugüne ..., r. 23, 24

[6] Georges Perrot, Kurdên Haymanayê, weşana apec, werger: Fawaz Husên, r. 33, 34, 43, 49, 50, 51

[7] Mark Sykes, The Kurdish Triebs of The Ottoman Empire; The Journal of The Royal Antropological Institute Great Bratin and İreland, 1908, r. 455, wergera ji îngilizî: Eva Karlovics û Nuh Ateş

[8] M. Bayrak, Keşanli Ali mi Kürt Cemali mi?, Bîrnebûn 25, r. 81-84 û Ahmet Fatih Yilmaz, Ankara/Altındag Şeyhbizinlari,www.seybizin.com, wergirtin: 1 ê Adarê 2009

[9] Enver Yurtdaş, Hamdi Çeker, Faik Coşkun, Dünden Bugüne Yenice ve Şeyhbizinlar, r. 9

[10] N. Ateş, Muzaffer Özgür, Kürt Ulusal Mücadelesinde Orta Anadolu Kürtleri, Bîrnebûn 19, r. 24,25,26

[11] Mahmûd Lewendî, Kurdên Şêxbizinî, Bîrnebûn 3, r. 79, 82 û Seyyah Kandemir, Haymana ve Bala Kürtleri, Bîrnebûn 7, r. 39

www.arsivakurdi.org

[12] Çavkanîya berî vê (Ç.b.v.), r. 97
[13] Halîl Îbrahîm Uçak, Tarîh Îçînde Haymana, 1986, r. 151
[14] Mahmud Azîz Hesen, Kurteyek Le Mêjûy Hozî Caf û Basî Hendek Le Tîrekanî, 1985, Silêmanîye, r. 7-10 ; Transkripsiyon: Mahmud Lewendî, Bîrnebûn 4, r. 64- 65
[15] W. D. Hütteroth, Ländliche Siedlungen im Südlichen İnneranatolien in den Letzten Vierhundert Jahren, Heft 46, 1968, Üniversität Göttingen, r. 45-49
[16] Rafet Balli, Kürt Dosyasi, İstanbul, 1991, r. 83
[17] H.Î. Uçak, Tarih İçinde Haymana, r. 151
[18] Li ser vê mijarê li van çavkanîyan jî binêre: M. Lewendî, Kurdên Şêxbizinî, Bîrnebûn 3, r. 82, 97 û Rohat Alakom, Orta Anadolu Kürtleri, weşana apec, r. 69 û Dr. Mîkaîlî, İki Kitap .., Bîrnebûn 37, r. 52 û Mark Sykes, Thê Kurdish Triebes of The Ottoman Empire; The Journal of The Royal Antropological İnstitute Great Britain and İreland, 1908, r. 481
[19] Enver Yurtdaş, Hamdi Çeker, Faik Coşkun, Dünden Bugüne..., r. 9-11 û
[20] Mahmûd Lewendî, Kurden Şêxbizinî, Bîrnebûn 3, r. 80-96 û Bîrnebûn 5, r. 86-99
[21] Mahmûd Lewendî, Kurdên Şêxbizinî, Bîrnebûn 3, r. 79, 80, 89
[22] Amîr Hassanpour, Kürdistan'da Milliyetçilik ve Dil, avesta, r. 80-81
[23] Ç.b.v. r. 79
[24] Mahmûd Lewendî, Kurdên Şêxbizinî, Bîrnebûn 3 , r. 82
[25] Şerefxanê Bedlêsî, Şerefname, weşane apec, r. 128
[26] Mehrdad R. Îzady, Kürtler, weşana Doz, r. 308-310
[27] Li van çavkanîyan jî binêre:Şerefxan Bedlêsî, Şerefname, weşana apec, r. 158, Celılê Celîl, XIX. Yüzyil Osmanli İmparatorllug´unda Kürtler, Öz,Ge, r. 21, 24, 29, 61, 75 û Cevdet Türkay, Osmanli İmparatorluğ´unda Oymak, Aşiret ve Cemaatlar, Kaynak Eserler Serisi: 1, r. 154, 700
[28] Mahmûd Lewendî, Kurdên Şêxbizinî, Bîrnebûn 3, r. 97
[29] Mahmûd Lewendî, Kurdên Şêxbizinî, Bîrnebûn 3, r. 82 û Şerefxan Bedlêsî, Şerefname, weşana apec, r. 158
[30] Mahmûd Lewendî, Kurdên Şêxbizinî, Bîrnebûn 3, r. 82
[31] Mehrdad R. Îzady, Bir El Kitabi Kürtler, Doz, r. 102, 168, 171, 173, 177
[32] Dr. Mikaîlî, Aşiretler Raporu`nda Orta Anadolu Kürtleri, Bîrnebûn 21, r. 64: Jêrenota Dr. Mikaîlî bi nîşana DM
[33] H. İ. Uçak, Tarîh İçinde Haymana..., r. 151 û Enver Yurtdaş, Hamdi Çeker, Faik Coşkun, Dünden Bugüne Yenice ve Şeybizinlar, r. 5-6 û Rohat Alakom, Kurdên Anatolîya Navîn Li koka xwe Digerin, Bîrnebûn 20, r. 21
[34] Şemseddin Sami, Tarihteki İlk Türkçe Ansiklopedide Kürdistan ve Kürtler, weşana Deng, r, 65, werger: M. E. Bozarslan
[35] Mehrdad R. Îzady, Bir El Kitabı Kürtler, Doz, r. 171
[36] Çavkanîya berî vê, r. 102
[37] Arşak Poladyan,VII.-X Yuzyıllarda Kürtler, Öz-Ge, r. 45.
[38] Mehdad R. Îzady Bir El Kitabi Kürtler, r. 107, 109
[39] Celîlê Celîl, 13 Rûpelên Balkêş ji Dîroka Gelê Kurd, Înstîtuta Kurdzanîyê,Wien, r. 63
[40] Şerefxan Bedlêsî, Şerefname, weşana apec, jêrenota C. Rojbeyanî, r. 520
[41] Reallexikon der Asyriologie, erster Band, Hrsg. Ernest Jacob Eberlin, Bruno Meissner, 1978, r. 440
[42] Cîgerxwîn, Tarîxa Kurdistan, 1, Roja Nû,1985, r. 69 – 72 û Dr. Cemşid Bender, Kürt Tarihi ve Uygarlığı 2. Baskı, Kaynak Yayınları, 1991, r, 17-26

www.arsivakurdi.org

SALNAMEYA ZERDEŞTÎ Û SALNAMEYA MÎLADÎ

Li gor salnameya Zerdeştî sal û demsal weha ne. Roja 1ê nîsanê (21ê adarê) rast li nava dunyayê dixe (ekvator) û roj û şev dibine weke hev. Yanî roj dibe 12 saet û şev dibe 12 saet. Dunya ber bi ronahî û germbûnê dere, zivistan diqede û buhar tê. Kurd û ew xelkên ku berî Zerdeştî bûn bi vî hawayî rabûn navê Newrozê yan jî Roja Nû ji xwe re weke sersal qebûl kirin. Heta nuha jî weke sersal pîroz dikin.

Rewş weha ye:



www.arsivakurdi.org

Ji 1ê temûzê (21ê hezîranê) şûnda cîhan dîsa çerx dibe û berê xwe diguhere heta 1ê oktoberê, yanî li gor mîladî 21ê sebtemberê.



1ê oktoberê rewşa dunyayê weha ye.

Payîz dest pê dike



Buhar dest pê dike
Roj û şev weke hev in
Roj 12 saet, şev 12 saet

Ev dem jî cuhu (yahûdî) weke sersalê pîroz dikin. Li gor baweriya wan sal diqede û saleke nû dest pê dike.

(Hevalekî min î bi navê Jacki Jackobsi vê Newroza me pîroz dike û ez jî hersal serê sala wan pîroz dikim.)

Bi swêdî "Höstdagsjämning" dibêjinê û êdî destpêka zivistanê ye.

Dîsa roj çerx dibe û 1ê ocaxê (21ê decembrê) dunya çerx dibe û berê xwe diguhere:

Weha dibe:



Zivistan rojên herî kin in.

Havîn rojên herî dirêj in.
1ê ocakê (21ê decemberê)
"Mittvinterdagsståndet"

Berî ku ji Kurdistanê bê Ewrûpayê ev roj weke sersal dihat pîrozkirin. Dema ku salnameya mîladî li Romayê çêkirin, rojçêbûna hezretî Îsa weke destpêka sersalê qebûl kirin, 24ê decemberê. 6 roj şûnda weke sersal qebûl kirin.

Yanî sal 10 rojan bi paş ve xistin. Ji bo vî hawî demsal herdem dikeve 21ê decemberê, 21ê adarê, 21ê hezîranê, 21ê sebtemberê. ESASEN.



Şexmus

www.arsivakurdi.org

Rojek ji rojên min

Ji bo pîrozbayiya Newrozê, Federasyona Komelên Kurdan, li Stockholmê şevek şênayiyê amade kiribû. Min xwest ez herim, min cilûcorên xwe hazir kirin, ji stresê re lingê min terişî û ez bi çoka ketim erdê. Ez li mal bi tenê bûm. Qirîniya min yek erd û yek jî li ezmana bû! Kesekî ku di vê demê de li hawara min bihata tunebû. Min xwe bi zorê gihand telefonê û ji kurê xwe re telefon kir. Lawê min hema hat û ez birim nexweşxaneya Huddingê.

Em çûn akûtê, doktor lê mêz kir û got; di bin kapaxa textikê junîyan de torbên avê hene, ew teqîyane. Tiştekî ku em bikin tuneye! Ev ê bi xwe û bi xwe di hundirê du heftan da xweş bibe.

Bi dûre ez hatim mal, tiştekî ku bê kirin tunebû.

Di hejmara Bîrnebûnê ya 40 î de min bi sernivisa "***daxkirin***"ê de bahsa bavê xwe kiribû. Wê dema ku tiştekî wisa dibû, dermanek bi navê *hewekeş* çêdikir û dida ser. Ew hat bîra min ku bavê min çing çêdikir. Ez rabûm min ew dermanê bawê xwe, bi xwe çêkir û da ser çoka xwe.

Ew dermana weng tê çêkirinê; ard, av, rûn, xwê û hinek şekir li hev dixî û mîna tîrtê li ser êr dikelînî. Dûra dixî ser cawekî ecer û bi germî li ser birînê dipêçî.

Min ew dermana eynî weng çêkir û pê birîna xwe pêça û li malê bi tenê rûniştim. Ji ber êşa xwe û neçûna şênayiya Newrozê, dilê min zîz bû û kelagirî da ser min û ez bi xwe û xwe girîyam.

Di vê navberê de hate bîra min ku ev hejmara dawî ya kovara me, Bîrnebûnê bi deng û li ser CDyê jî hatibû belavkirin. Ji bo belavkirinê ji min re çend heb hatibûn. Min bi xwe hîn guh nedabû ser.

Dilê min nedixwest ez tiştekî bikim. Min got ka ez vê CDyê guhdarî bikim.

Min CD da ser û guhdarî kir. Ew deng ji min re bû hevalek û tenêtiya min bi min re par ve kir. Her nivîsek bi serê xwe xezîneyek bû. Kêfa min ji giştîkan re hat. Mala hemû nivîskarên Bîrnebûnê ava be, ev nivîsên xweş nivîsandine. Bi taybetî silavên germ bo Dr. Mîkaîlî ku lêkolîneka dûrûdirêj li ser koka malbata xwe kiriye. Min pir tişt jê hu kir û pê serbilind bûm!

Herwiha disan ji kekê Nuh Ateş ku li ser Bilika lêkolîneka berfireh kiriye. Wan herdu lêkolînan zanetiyeka baş

www.arsivakurdi.org

dan min, wek hemû nivîsên din.

Lê divê li vê derê, ez bahsa nivîsa kek Beko jî bikim, ji bo ku wek herdem bi gotinên xwe yên îronîk û ken hêstirk di çavên min de hişk kirin. Min ken û girî tevehev kir û ew roja min ya tarî li min ronahî bû ku min êşa xwe ji bîr kir û ketim nav çêroka Beko!

Beko, mala te hezar carî ava be û tu hertim bi wan çêrokên xwe yên xweş bi me ra bî!

Dora dina rê(royê) divê ez biçûma kongra "Komela Dostaniya Kurd û Swêdiyan" ku ez bi xwe jî di komita rêvebiriya komelê de me. Ji ber vê jî pêwîst bû ez li kongrê bihatima dînê.

Ez ji wê jî mam!... Herçiqas ez li kongrê nehatim dîtin jî, di kongrê de ez dîsan hatim hilbijartin. Min dixwest ew bar li ser min biçûya. Lê mala wan ava, ez ji vî barê xilas nekirim!

Piştî ku min bi xwe çend caran guhdarî li CDya kovarê kir, min li derûdora xwe re bahsa wê kir û pênc kes bûn abone. Kêfa wan jî wek min jê ra hat. Ji bo ku xwendin zehmet e. Guhdarkirin ji wan re hîn rihet e!

Ez bawer dikim feyda wê yê pir bibe. Însanên me ê hin pir bixwazin guhdarî bikin.

Altun Başaran ji Altilera



www.arsivakurdi.org

Reinerstraße 34
47166 Duisburg, W. Tyskland

Seyfi Doğan

Min li saetê mês kir ku saet tê yazdehan. Piçeke din jî di nav nîvina de xwe tev da û li saet dazdeh re çeyrek derbas bû rabûm ser xwe.

Yêkê gulanê bû.

Osê Yêxip û Hesê Hecê danî şevê kar kirin. Ew ê hîng raketine. Hesê Gulê di cîyê xwe da tune. Ew dîsa çû ber derî.

Fevziyê Malê Lalê û Hacikuşî Malê Gulê danî sibê çûne kar. Ez û Hesî Gulê em î wê rojê azad bûn.

Çar vardiyan li fabrikê kar dikirin û bi novê danek azad diman.

Em seş kesên ji gundî hevdû, di odekê da timan û me giştike jî li Thyssenê kar dikir.

Min ava çayê da ser êr û çûm ber



Bruckhausen - Thyssen Foto: Harald Finster

www.arsivakurdi.org



Fabrika Thyssen Foto: Harald Finster

pencerê û li derva mês kir. Dumanêki qîlîsipî ji pacên Thyssênê wek axûyê kobrakî berve ezman rêz dibû.

Di navbarê malê me û fabrikê re rê derbas dibû. Me netiverî ku tekên malê vekinî.

Mala Thyssenê bişawita, xopanê wek dêlegureke har e. Çi tê ber devê dadiqultîne û dike hesin û pola.

Fabrikê ne serî xuya dike ne paşi. Wan hesin û polan kuve terin? Kî dikire? Pê çi dikine? Xwedanê Fabrîkê kî ye?...

Min bi xwe û xwe got; here nûhe gûnegingên ku yê li ber firinê kar dikine. Fewzî bi Heckuş ve, here ku heta niha, li ber çîkên hesine ku dipişkên û germiya firine çend caran kirasên xwe guherandin û xu ji canî wanan herikî.

Min çay dem kir û ji bo ku bangê Hesî Gûle kim û dest û serçavê xwe bişom daketime jêr. Di xaniyê ku em tê da timanî banyo tune bû. Me li fabrikê duş dikir. Bi hemî xanî tuvaleteke tenê ew jî yê li qatî dawîyê bû.



Bruckhausen - Thyssen Foto: Harald Finster

Hesê rojên xwe yên betal li ber derî xanî ku em têda timanî derbas dikirin. Hes, li ser linga heta êvarê li ber derî dadiwestî.

Sokaxe ku male me têda, himê kin û him jî xewle bû. Li hemberî malê me *gasthaus*eke yekî tirk habû, wê jî xwedên ji nîvro bi şunda vedikir û mivanên xwe piranî aynê insan bûn.

Wekî din jî ne dukanek ne jî qehvexanek habû. Karkerên ku di malên li ser kuçê da timan, karkerên Thyssenê bûn û piranî ji wanan *gastarbeitare* bûn. Ji her welatan karker habûn. Lê piranîyê wanan tirk û kurd bûn. Piranîyê kurdên ji Anatoliyê Navîn bûn.

Xanîyê li dor alîyê fabrîkên ji dumên reş dikirin. Wextê ku merî li xanîyan mês dikir hundirî însanan reş dibû.

Jîyan li gore kar û barê Thyssenê hatîbû pîlankirin. Hertişt giredayê fabrikê bû. Tatila me, perê me, kar û sewtê me.

Me bi Hesê ve kahvaltîya xwe kir bi şun da, Hes dekate jêr min ji hazirîye xwe kir ku ji xwe ra herim li nav

www.arsiv.org

dukanan bigerim. Havîne nezik dibe. Hezirîyê îzinê bikim. Ji mal û merlixîyê re xelatan bikirim.

Min qêmişê pera nebir û pêya da rê ku herim cîhê dan û sandinê. Jîyana me li ser pere qazanckirine û tasarûfê hatibû dagirtin. Ne kincekî rind ne jî xwarine ke xweş. Bi hevdigîne! Rojekê pêş da vegere. Jîyana me li navbarê mal û fabrikeda derbas dibû.

Ez tam hatim ser pira viadukta di ser rîya hesin re derbas dibe ku du kes bi ber ve min da têne. Di navbera min û wanan da wiqasî du û sê gav mabû ku ew ji yêk re dawestîyan û herdûye bi hevdu re, bi dengekî otoriter gotin; *"raus scheisse ausländer"*.

Ez mat bûm. Min nizanî ku cing hereket bikim. Mina darake hişîkbûyî, bêcan wextekê dawestiyam. Min xwe winda kir. Wextê ku ez heşare xwe bûm, ew cûm bûbûn.

Serê min êşî. Hundirê min li hev diket. Dilê min teng bû. Dunê bi ser minda helşîya. Min ew cima bi wê qûnê berdan!.. Qehirîm!..

Ez ji çûyîna carşîyê poşman bûm û vegeriyam mal. Ku Hesê Gûlêyî hîng li ber derî dawastiyê. Hesê tu şor nekirin. Min jî jê re buyêra ku hatî serî min kat nekir û helkiştime qatê ku em têda diman.

Min xwe li ser doşekê dirij kir û katime nav xem û xeyalan. Min pir fedî kir û bi ber xwe ketim.Wa herdu însanan ez ji welati xwe qewitandim. Erê wanan ez qewitandim!..

Min di jîyanê xwe da çand carên din wiqas fedî kir û ber xwe ketim; berî ku ez herim Almanya, wexta ku min simbêlên xwe birin û xwe serqot kir. Carekê jî li mektebê, dema ku mexlim ji bo ku min bi kurmancî deng kir li min xist.

Eger Meister ekstra kar bida, va jî nedihate serê min. Min ê pere kazanc bikirana û rokê pêşda vegeriyama gundê xwe.

Li gund, min her derek gav bi gav nas dikir û dizanî. Ji kurikên gundê ku di qundaxê da bigre heta gorên goristên nas dikirin. Min dizanî roj ji kuda heltê ji kuda diçû ava.

Bi şev hestirk nasên min bûn. Min çavên xwe girtî, di bihnê re dizanî ku ezî li ku derê gund im. Her cihekî bihneke xwe î taybetî habû.

Min heywanên çolê nas dikirin. Dêle gura ku li çîyayî ortê û qartalî çîyayî înê gewr.

Li hemî gundên cîwaran geriyame û nas û dostên min î hene. Li gundên tataran, çerkezan, tirkan û kurdan. Taw û taw! Di vê navberê de, dema ku min ew mal û xilena dikirine ez î ketime xewê.Ez ji xewê rabûm ku ez î di xuyê da reş bûme.

Min xewnên xwe dîtin; Kalekî rî-

www.arsivakurdi.org

sipî li ber firinê hesin, li ser postî bizinekê runiştîyê û î li bilûre texê. Ziravekî kezabşewitî, giran, xemgin û xembar; her notake xwe wek perikekî şikeştî .

Car û caran di navbera da bi şor digot; "were komê" û dîsa dest bi bilûre dikir.

Dengî bilûrê di hundirî fabrikê da wek barxê ber kozê î sêwî dinalî. Hesin û bêton deng nedidan.Wanan dunê xwe dunêke din bû.

Du gogircîyên sipî yê ku perikên xwe dişewitî berve ezman firîn. Dengî bilûrê ne ezman ne jî erdî dibihist. Lê ne xem kalê bû. Wî ji xwe re lêtexist.

Bahozek rabû. Xulîyê bi xwê barî. Çav şewitîn. Çav çavan nedîdîtin. Însan li ser rîyan bûn. Kurik, keçik, bûk, kal û pîrên bêtaqet bi rêhêlê kerwanan ketine.

Kincên li sirt nemane. Çarixê di lingan da bûne yek kêr zendiyan dibirine.

Zarokî digirîne. Pêsîrên wek çermekî li ber rojê hişîk bûne. Kalê dîsa li navbaran digot; "*were komê*".

Dema ku kalê zirafe qedand; bi hêrs bilûre xwe avite firinê. Dengên ku di hundirî bilûre da mayî bi hevdi re kirine qirinî, hawar û hawar heta ku bilûr helî.

Kalê destê xwe kira nav firinê hesin û çengek hesin derxist. Hesin, li ser erdê lût kir û tîrê marak ji barîyê xwe derxist û di navbarê hêsin re derbas kir û hesin kire lolibek. Bi didanî xwe heft qul vekirin.

Deme ku li bilûr ceriband, ji her quleke bilûrê, ziravên çeşit û çeşit peyda bûn.

Erê.. Hans erê... Ez ê rojekê vegerim Hans. Ez ê rokê ji vir herim. Li paş xwe jî mês nekim. Va kêmasiyên min en ku mayî, berve hevdu hunim. Ez rojekê tenê danawestim!

Ez ê şiv û kulavî xwe ji sanduqê bi merasim derxim. Ez ê ji xwe re keriyek pez û John Deereyek xwe yî kesk bikirim.

Pezî xwe zivistanan li hefşoyan îdare bikim. Havînan jî fêz bi fêz bigerînim.

Berbangan li zozanan li zirafî qamuşî Qul xim.

Devdevê rojhilat, berî mîyên xwe berve mal kim. Bi şîrî mîyên karamanê xurînîya xwe bikim.

Xwe li ser kulevî xwe yî ji herîyê direj kim û laşî xwe, bi ber rojê dim.

Ez ê hewayê serî sibeyî wek şîrî dayikê pak bikşînime hundirê xwe. Kîngê dilî min xwast wê wextê rakevim.

Zivistani sobê xwe dagrim, bi arî kerme dadim. Nanî xwe li ser hişîk bikim, runî û penêrî mîyan di nav kim.

Ez dê John Deerî xwe rûn kim. Depo tiji diesel kim, wextê ku bihar hat ez dê

www.arsivakurdi.org

ergê xwe bikim û firiskîyê mîna Mexmî Hucê ji dil da lêxim.

Ez ê, li ba mal û merlixiyê xwe bim. Axê gundî xwe gav bi gav gav kim û li siyê xaniyê ji kerpiçê ku bihne jiyane jê tê, runim û bi nasên xwe re sohbet bikim û bi heneke jiyanê qelaw bikim.

Dîsa jî mala we ava be, Hans!.. Va çend sal in, we ez kirim mîvan. Min rizqê kurikên xwe tedarik kir. Gerçî tiştekî bêbedel neketîye destên min.

Her fennigî ki ku min qazanc kirîye xuyê henîyê min e. Lê dîsa jî Hans, ez nehatibûma Almanyayê kirîk çi bikim?.. Bi milyonan insan, li cîyêkî ku emegî xwe bifroşin digerine.

Danke Schön Hans! Danke!

Va dera ne ji min re ye. Ez li colê, li bin ewrên heşin mezin bûme. Dem û war ên min bûn. Roj a min bû. Tuneyî habû, lê bedelî xwe yî hendik bû, Hans. Saet wiqas ne bi kiymet bû!..



Dimenek ji fabrika Thyssen Foto: Harald Finster

www.asivakurdi.org

gotin malê te av heyneye
dilê min jî amade bû
dûnê bi insanan şîrîn e
ez rêz bûm çûm gund

ez ji demê derûdorê şungerîyê
meha adarê û nîsanê hezdikim
cîhê ku anahîta û armaitî lê bu yî
ez ê cima li xizanîyê bi hewes kim
jîyan xelete mirnîyê
xwazkê ku sîdurî jî li keleke min habûya
minê guh bi ser şîretên wê da

qirinên cezb kirine ku
bi sabir we dema payî
li hewa dihilîzine
ayînên çûçikên ku li ser daran daniştine
min digehinin ezmanên hundirî min
mesaj hevdu dibînin
hisên xwe ji hefsaran difilitînin
çemên avê û xwînê damarên ferah û tiji dikin
ajdan axê diwerimînin
xewê direve avê li didanên tabietê dilîzê
welhasil jîyan î dewlemend e
û demeke ku tabiet mirnîyê ji bîr dike.

ez î li ser axe xwe me
bîranînan ez î xemilandime
ji xwedê hîn çi dixwazime

hewesên sîwar in
tabietê qelender e
her zindîyekî bedewîyên xwe teşhîr dike
şewq û bihnên xweş ortalixê heynaye
xwinê germ e bûx û dumanî ji erdê berve ezman diherike
ax bihar ax zu û zu vegere
aynê roj du caran ji rojhelat da helnayê

www.arsivakurdi.org

ez î li ocaxî kevîrê gewr bûm
ji nişka ve
li kêlekê hevdu
di jîyangeha xwe ya esil da mest
du kûçîkên sipî
wek hakate çerokekê
mina du kûzê tiji şir
wek du hotên ji êr
li dawîyê çîyayî herşîd pêyda bûn
ji xwe xweş
bi xwe bawar
boçên wanan li hewa
bi lez û bez
wek du birûskên biharê
berjor bi çîyê da hêl bûn çûn
min li doraliyê xwe nerî
tu kerîyên pêz min nedîn

çîyayê ku
heta wê demê
bi tenê
bêmane
tamsarkî
sêwî

û
tazî
germ bû
kelî
şewitî
xemilî
û
şen bû

Seyfi Doğan

www.arsivakurdi.org

Lewendê

Amedekar: **Gursel Dayan (Qemerî)**

Ev strana "Lewendê" di nav kurdên Anatoliya Navîn de weke sitraneke gelêrî nav û dengê xwe heye. Gelek dengbêjên ji herêma Anatoliya Navîn vê sitranê dibêjin. Gürsel Dayan tev gotinên vê sitranê, notayên wê jî amade kiriye. Em di vê hejmara Bîrnebûnê de amadekirina vê sitranê jî ji bo we xwendevanên hêja diweşînin. Red.



Toy toy toy lewendê
Sîng gewrê baliq zendê
Ez qurbana wê rindê lê
Rind hat kete govendê
(Çing dikşîne govendê)

Berfek barî kepek e
Rebbî ellah weng neke
Pir silava li xwesî ke lê
Ma îşev qêpî veke
-dîsa gotin- (tekrar)

Baran barî nebarî
Xelk û alem gişt cot guherî
Min bi te va dilek girt lê
Gundî gidiya li me qarî
- dîsa gotin-(tekrar)

Bazda bazda di cî da
Binê nigê wê xu da
Hûn li rinda digerin lê
Rindî van e di vir da
- dîsa gotin- (tekrar)

www.elsivakurd.org

MAHMUTLU KÖYÜ ANATOMİSİ ÜZERİNDEN ŞÊXBILAN AŞİRETİ TARİHİ -1-

Şêxbilan aşireti´nin, Kırşehire iskanını ele alacağımız bu çalışma, "Kırşehir Kürdleri tarihini bilme ve öğrenme süreçlerine katkı"motiv ve kaygıları ile yapıldı. Hazırlık aşamasında birçok kaynak ve belge gözden geçirildi. Onlarca bireysel anlatım tek tek değerlendirildi. En ufak detay dahi değerlendirildi. Bütün bu uğraşlar sonucunda ortaya bu çalışma çıktı.

Beni bu çalışmayı yapmaya cesaretlendiren, ortak kaygıları paylaştığıma inandığım dostlarım oldu. Yadsınmayacak katkılarını gördüğüm; Hacı Deniz, Nurettin Çiçek, Metin Dinç, Cüneyt Dağdalan, Cengiz Demir ve Mila Kara ya metavazi katkılarından dolayı teşekkürlerimi iletmek isterim.

Muhterem Hacı Deniz`in ismini yeniden zikr etmem gerekiyor. Verdiği bilgiler bu çalışmanın ana çatısını kurmakta belirleyici bir rol oynamıştır. İlerlemiş yaşına rağmen, hafızasına yüklediği ve yıllarca özenle beslediği bilgileri benimle severek paylaştı. Onun yer yer gıpta ettiğim hafızasına, hayran kaldığımı bu arada itiraf etmeliyim. Günlerce süren uzun sohbetlerimizde bana değeri ölçülmez bilgiler verdi. Bu bilgilerin ışığında tarihi kaynakları, belgeleri belirli bir sistematik içerisinde inceleme, doğruluklarını sınama olanağım oldu. Bu anlamda kendisine teşekkürlerimi yeniden iletmeyi bir borç biliyorum.

Mahmutlu, Şêxbilan aşiretinin Kırşehir`de kurduğu ilk köylerden birisidir. Nüfus yoğunluğu ve kabile dokusu açısından etkin ve büyük bir köydür. Birçok köyün kurucu aileleri Mahmutlu`dan ayrılmadır. Mahmutlu`nun tarihi bir anlamda Şêxbilan`ların tarihidir diyebiliriz. Bu sebebledir ki yazımızın başlığını "*Mahmutlu Köyü Anatomisi Üzerinden Şêxbilan Aşireti Tarihi*" olarak aldık. Dileğim bu çalışmanın Kırşehir Kürdlerinde çoktan başlamış olan"Tarihini Bilme ve Öğrenme süreçlerine katkıda bulunmasıdır.

Silav û hurmet
Vahit Duran

www.arsivakurdi.org

KIRŞEHİRDE BİR REŞWAN AŞİRET KOLU: „ ŞÊXBİLAN "LAR

Kadim ve tanınmış bir Kürd aşireti olan Reşwan`ların (Reşî, Rışvan) ana yaşam merkezlerinin Adıyaman-Maraş-Antep dolayları olduğu bilinmektedir. Tarihi süreç içerisinde iskan ve sürgün yaptırımlarına maruz kalan aşiret geniş bir coğrafya ya dağılmış veya dağılmak zorunda kalmıştır. Suriye`nin kuzey-batısına düşen Halep`ten başlayarak, Kilis, Çîyayê Kurmênc, Islahiye, Mardin, Urfa, Diyarbakır, Kars, Ağrı güzergahından geçerek, Horasan ve Kafkasyanın içlerine kadar uzanan Kürd yerleşim alanlarında Reşwan kabilelerinin izdüşümlerine rastlamak mümkündür.

Reşwan`ların yoğun olarak yaşadıkları bir bölgede Orta Anadolu`dur. Ankara-Konya-Kırşehir il sınırları içerisine iskan olmuş olan aşiret, yaygınlığı ve nüfus yoğunluğu açısından bölge içi bir "Aşiretler Konfederasyonu" özelliği taşır. Orta

Anadolu`daki Reşwan`ların 6 kolu Kırşehir il sınırları içerisinde bulunur. Çalışmamıza konu olan "Şêxbilan" aşireti bu kollardan biridir. Diğerleri ise Mifîkan, Molîkan, Bilikan, Oxçîyan ve Berketî aşiret kollarıdır.

Şêxbilan`lar, il merkezinin kuzeyine düşen, halk arasında "Axzê Çole" olarak tanımlanan bölgede toplam 10 köy



Konên Eşîran Çavkanî: Gertrude Bell 1905

kurmuşlardır. Coğrafik konumlanışları il merkezi ile Çiçekdağ ilçesi arasındaki geniş ve düz alana yayılmış olan Mifîkan ve Berketî köyleri arasındaki bölgedir. On köy içerisinde Çewêrme (Çevirme), Torino (Bahçepınar) ve Qişle (Mahmutlu) yerleşime açılan ilk köylerdir. Diğerleri yani Çemala (Çamalak), Çîdali (Çiğdeli), Zêqere (Zekere), Ûçqî (Üçkuyu), Remiko (Doğankaş), Hociko (Çanakpınar) ve Gêder (Pöhreng) bu üç köyden ayrılan kabileler tarafından kurulmuşlardır.

Özellikle Çemala, Çîdali, Gêder, Ûçqî ve Zêqere köylerinin kabile dokusu Qişle ile hemen hemen aynıdır.

Reşwan aşiretinin çoğunluğunda olduğu gibi Şêxbilan`larda sünni inancın "Hanefi" yorumunu benimserler. "Axzê Çole" de yapılan ilk camii -Çevirme köyü 1874- ve tanınan iki dini şahsiyet "Xoce Sor" ve "Xoce Reş" Şêxbilan`lıdır.

Kürdçenin Kurmancî lehçesi ana dilleridir. Kırşehir il merkezi, Yerköy, İstanbul, Viyana, Ankara, İzmir son-

www.arsivakurdi.org



Ava Reş Çavkanî: Gertrude Bell 1905

radan göç edip yerleştikleri şehirlerin başında gelir. Karekteristik özellikleri açısından gelişmeye, yeniliğe gayet açıktırlar. Eğitim seviyesinin diğer kollara oranla daha hızlı geliştiği ve hatta ileri olduğu genel bir görüştür. Bu bilgilerin ışığında Şêxbilan aşiretinin temel özellikleri ve Kırşehire iskanına geçebiliriz. İlk önce aşiretin ismi üzerinde duralım.

AŞİRETİN İSMİ ÜZERİNE

İsimlerin etimolojik değeri, tarih ve köken araştırmalarında önemli bir yer tutar. Geçmişi bilme ve öğrenme açısından bazen anahtar bir rolde oynar. Bu anlamda Şêxbilan aşiretinin ismi üzerine durarak bazı çıkarsamlarda bulunmak istiyoruz. Aşiretin ismi halk arasında "Şıxbıl", "Şıxbıla", "Şeyh Bılan" biçimleri ile telaffuz edilir. Biz tekil anlamda Şêxbil, çoğul anlamda ise Şêxbilan söyleniş ve yazılım biçimini tercih edeceğiz. Sebebi de anadilimiz olan Kürdçe`ye yani özgün hali ile örtüşmesidir.

İsmin kelimesel anlamı ve kökeni, bizi kesin yargılara götürebilecek veriler sunmamakla birlikte bazı çıkarsamalar yapmamıza olanak sunmaktadır. Birisi: ismin iki kelimeden oluşma halinin verdiği anlamdır. Diğeri ise: Aşiretin geçmişte yaşadığı ve kış aylarını geçirdiği (Kışlak) bölge olan "Belen" ilçesinin asli ismi ile olan ilişkisidir.

Bir açıdan baktığımızda aşiret isminin "Şêx" ve "Bil" veya "Bilo" kelimelerinin birleşiminden oluşmuş olabileceğini söyleyebiliriz. Şêx türkçede anlaşılacağı gibi Şeyh anlamına gelir. Bil (Bıl) veya Bilo (Bılo) da erkek ismidir. Bilan (Bılan) derken burada an eki türkçedeki „ler", „lar" ekine denk gelir ki;" Şeyh Bılolar" veya „Şeyh Bılonun Efradı" gibi anlamlar ortaya çıkarılabilir. Buradan yola çıkarak, aşirete adını veren ve aynı zamanda Şêx (Şeyh) olan bir şahsiyetin olduğunu iddia edebiliriz. Nitekim aşiretler tarihinde benzer isim oluşumlarına çokça rastlanılmaktadır. Bir kaç örnek vermek gerekirse: Omeran (Omar), Xalîkan (Xallo, Xelîl) , Nasiran (Nasır) vb.

Bu çıkarsamanın doğruluğu, yani böyle bir şahsın olup olmadığı, nerede ve hangi zaman dilimleri içerisinde yaşadığı konusunda başta ifade ettiğimiz gibi elimizde kesin bir bilgi ve veri bulunmamaktadır. Diğer yanda, aşiretin Kırşehire yerleşmeden önce yaşa-

www.arsivakurdi.org

dığı bir bölgelerden biride "Belen" dir. Bugün İskenderuna bağlı bir ilçe olan Belen, Osmanlı döneminde Halep sancağı içerisinde olan ondört kazadan birisiydi. O dönemki ismi Belen değil "Bilan" dır. Sonradan Belen olarak değiştirilmiştir. İskenderun–Halep şose yolu, Bilan kazasının içinden geçer (di). Yüksek dağ üzerinde bulunan iki yamacı birbirinden ayıran yol anlamınada gelebilen Bilan kelimesinin kökünün "Bil" olduğu, çoğul anlamı dolayısı ile Bilan olarak ifade edildiği tarihi kaynaklarda geçmektedir. Aşiret Bilanlı mıntıkasında yaşayan bir şeyh ile tanımlanarak Şêxbilan veya „Şeyhbilanlı" ismini almış olabilir.

Bu çıkarsama bize daha mantıklı gelmektedir. Çünkü aşiretin Kırşehire gelmeden önceki tarihine baktığımızda „Bilan" la ilgili verilere çokça rastlamaktayız. Muhtemelen burası Şêxbilan`ların Kırşehirden önce ana yaşam merkezlerinden birisidir. Kış aylarına doğru geri döndükleri merkezin burası olduğunu tahmin ediyoruz. Bilan daki yaşamlarını betimleyen bir çok anı ve anlatım arşivimizde bulunmaktadır. Bir tanesini burada örnek vermek gerekirse. Tarihe Egîte Şêxbilan (Şeyhbilanların Yiğiti) diye geçen bir şahsiyet Belen`de yaşamıştır. Yiğitlik sıfatını aşireti savunma da gösterdiği cesur ve kararlı tavırları ile el-



Gunede Qishlê Çavkanî:Mehmet Pala
www.mahmutlu.com

de etmiş olan Egît bir çarpışmada yaşamını yitirmiştir. Mezarı Belen`dedir. Ölümünden sonra dillere destan Atı-Hespê Dîgno -sahipsiz kaldığından yıllarca başıboş dolaştığı söylenir.

Bu durum halk arasında bazı deyimlere tema olmuştur. Tek başına ve avare avare dolaşanlara: Lo çi mîna Hespê Dîgno vêkes û bi tenê digerî deyimi söylene gelmiştir.

Bu örnekle ifade etmek istediğimiz Belen`in (Bilan ) Şêxbilan`ların tarihinde önemli bir yerinin olduğudur. Diğer yanda bu çıkarsamamızı kuvvetlendirebilecek bir bilgi daha aktarmak isteriz. Belen ve civarı Şeyhleri ile ünlü bir bölgedir.

Onlarca şeyhin türbesi burada bulunmaktadır. En ünlü ve tanınmış Şeyhte „Şeyh Bereket" hazretleridir. Dare-i İzzi köyü civarında yüksek bir dağın zirvesinde türbesi hala ziyaretçilere açık bir biçimde durmaktadır.

Biraz öncede ifade ettiğimiz gibi aşiret ismi üzerine yazdıklarımız daha çok çıkrasamlaarı içermektedir. İsmin kökeni ve etimolojik anlamı hakkında

www.arsivakurdi.org



Derwêşe Eşê

kesin bir yargıya şimdilik varamıyoruz. Ama billdiğimiz bir şey varki o da aşiretin özgün adıyla Osmanlı resmi kayıtlarına geçmiş olmasıdır.

OSMANLI KAYITLARINDA ŞÊXBILAN´LAR

Aşiretin, ana yaşam merkezinde bu adla tanımlandığını ve kayıtlara geçmiş olduğunu tespit ediyoruz. Önemli bulduğumuz iki kaynağa geçmeden önce 16. Yüzyılda Reşwan aşiretine bağlı cemaatlerin listesi verilirken Şêxbilan isminde geçiyor olmasıdır. 16. Yüzyıl tarihli Tahrir Defterlerinde Reşî (Reşwan) aşiretine mensub Bereketli, Bektaşlı, Belikanlı, Benamli, Cudikanlı, Dalyanlı, Dımışklı, Heycebanlu, Hıdıranlı, Hosnişîn, Mahyanlı, Nasırlı, Okçuyanlı, Sevirli, Sınkanlı, Şeyhbılanlı, Terziyanlı, cemaatleri içerisinde görüldüğü gibi "Şeyhbılanlı" isminide rastlıyoruz. (1)

Önemli bulduğumuz iki kayıta dönmek gerekirse, Biri 1608 ve 1752 yılları arası Kilis kazası idari kayıtlarıdır. Diğeri ise 1865 yılında Islahiye ilçesine bağlanan nahiyelerin kayıtlarıdır ki her iki belgede aşiret özgün adı ile geçmektedir.

Sunduğumuz bu kayıtların bahsini ettiğimiz Şêxbilan aşireti üzerine olduğunu belirtmeden geçmeyelim. Bir isim benzerliği olabileceğine bir ihtimal vermiyoruz. Çünkü devamında verilen bilgiler elimizdekilerle çakışmakta ve örtüşmektedir. Yani bu konuda kuşkuya düşülecek bir durum yoktur.

Bununla birlikte şunuda bilmeliyiz ki Osmanlı idari düzeninde, hareket halinde olan (konar-göçer; yılın belirli dönemlerini yaylak, yazlak ve kışlak arasında geçiren) aşiretler nahiye veya başka bir adla kaza statüsünde kayıt altına alınmışlardır. Bu şu anlama geliyor. Her ne kadar hareket halinde olsalarda, bağlı oldukları bir merkez, tabii oldukları yerel bir yönetici (Boybeg, Beg, Kethüda vs.) vede sahip oldukları bir adresleri vardı.

Yukarıdaki önbilginin ışığında mevcut kayıtlara geçebiliriz. İlk kaynak biraz önce bahs ettiğimiz gibi 1608 ve 1752 yılları arasında Kilis kazası üzerine tutulmuş kayıtlardır. Osmanlının egemen olduğu birimlerde her yıl tutulan bu bilgilerin düzenli bir biçimde merkeze iletildiğini ve „Mühimme Defterleri" adı altında tasnif edildiklerini biliyoruz. Tutanlarda bizzat dö-

www.arsivkurdi.org

nemin Osmanlı yerel yöneticileridir. Bu kayıtlar bugün Başbakanlığa bağlı Devlet Arşivlerinde durmaktadır.

Bunları inceleme, tasnif etme hakkı veya imtiyazı geçmişte belirli araştırmacıların eline verilmişti. Anlaşılacağı gibi bizde ancak onlardan öğrenebiliyoruz.

Bu araştırmacılardan birisi de Cevdet Türkay`dır. „Başbakanlık Arşivi Belgelerine Göre Osmanlı İmparatorluğunda Oymak, Aşiret ve Cemaatler“ çalışmasında verilen aşiretler listesinde Şêxbilan`larda geçmektedir. Verdiği bilgelerde aynen şunlardır. Şeyhbalanlı: Hısn-ı Mansur kazası, Rakka, Sivas, Haleb, Meraş, Malatya ve Ayıntab sancakları.

Ekrad. Şeyhbalanlı cemaati, Rişvan aşiretindendir [2]

Şêxbilan`ların yaşadığı birimler olarak belirtilen yerler bilinen tanınan ve bir çok kaynakta geçen yaşam merkezleridir.

Bu arada aşiretin „Bilanlı“ değilde „Balanlı“ olarak kayıt edilmesi pek çokça rastlanılan bir duruma örnek teşkil ediyor.

Gerek dönemin yerel yöneticileri, gerekse Cevdet Türkay`ın (Kürdçe bilmediklerinden) algılamada ve tercümede yaptığı hatadan kaynaklanıyor olmalıdır. Çünkü biraz öncede ifade ettiğimiz gibi devamında verilen bilgiler, aşiretin tarihi ve bulunduğu yerler ile tamamen örtüşen ve denk gelen bilgilerdir.



Hecîyê Milî Omî Usike xortanîye xwe de
Arşîv: Vahit Duran

İkinci kayıt ise, 1865 tarihini taşımaktadır. 1865 yılında „Islahiye harekatı“ çerçevesinde aşiretleri iskan etmek amacıyla bazı kazalar kurulmuştur. Bugünkü İslahiye ve Hassa kazaları bu dönemde kurulan kazalardır. Çevredeki birçok nahiye ve köy bu kazalara bağlanır. Yeni bir idari taksimattır bu. Şeyhler, Izziye ve Amiki nahiyeleri de bu taksimattan etkilenir. Bu 1876 tarihine kadar sürmüştür. Bundan sonraki taksimatlarda İzziye nahiye ve köyleri Kilis' e bağlanmıştır.

Şeyhler nahiyeside bağlanan yerleşim yerleri içerisindedir. Hane sayısı

www.arsivakademi.org

48 olan Şeyhbılanlı“ birimine burada rastlıyoruz.

1876 yılında Şeyhler nahiyesine bağlanan köylerin aynen şunlardır.

„Çalkama: 81, Cerhatlı: 32, Gülanlı: 47, Şeyh Bilanlı: 48, Gürganlı: 146, Gürganlı-yı Tahtanı: 93, Sarı Uşağı: 109, Sat Uşağı: 88, Sa'ulcik: 84 Gumit: 246, İncirli: 213, Şahiyanlı: 232,Kal'a: 32, Gümraş: 78, Halil Ömer Uşağı: 23, Hasan Gülgavı: 71, Kuda Köy: 122 Ömer Uşağı: 112, Ma 'mu i Uşağı: 427, Dönelli/Donilli: 205, Musiko: 216, Osmanlı: 73 Ba'oanlı 421:, Hulkiili: 38, Raco Oba: 113, Güranlı: 50, Hacı Halil: 250, Müskanlı/Müsikanlı: 62, Mamalı: 118, Cakmaklı 224 „ [3]

Alnıtıdan anlaşılacağı gibi hane sayısı 48 olan adı „Şeyh Bilanlı“ olan bir yaşam birimi 1865 de Islahiyeye , 1876 yılından sonrada Kilis kazasına bağlanıyor. Diğer köy ve birimlerin isimleri de bize yabancı gelmemektedir. Bu köylerle Kırşehir`deki Şêxbilan kabilelerinin hala devam eden ilişkileri vardır. Yazımızın devamında bu ilişkilere sık sık değineceğiz.

Kuşkusuz verdiğimiz bu bilgiler aşiret Kırşehire gelmeden öncesine ve geride bıraktıktığı akrabalarına ilişkin bilgilerdir.

Kırşehirde bu içerikte resmi kayıtların olduğunu biliyoruz ve sırası gelince değineceğiz. Yukarıdaki bilgilerin ışığında Şêxbilan`ların Kırşehire gelmeden önce yaşadıkları merkezlerdeki durumlarına bakarak Kırşehire kadar uzanan maceralarını ele alarak somut olgular üzerinde duralım deriz. Verilen bilgilerin daha iyi anlaşılabilmesi için kısa bir tarih gezintisi yapmamız gerekiyor.

KISA BİR TARİHİ GEZİNTİ

Reşwan`ların bir kolu olan Şêxbilan`ların yaşadığı bölge idari olarak 16. Yüzyıldan sonra Kilis kazasına bağlanmıştı.

Kilise bağlanan birimlerde aynen şunlardır. Halep, Birecik, Urfa, Samsat, Kahta, Gerger, Hısn-ı Mansur (Adıyaman) ve Amik Ovalarıdır. Bütün bu çevrelerde yaşayan aşiret mensupları İzzeddin-lü veya Kürt (Ekrad) kazası adı verilerek Kilise bağlanmıştı. Aşiretlerin Begide Mir-i Kürd olan Reşwanzade İzzeddin Beg ve onun efradıdır.

Mayıs 1696 (Eva' il-i Şaban 1107) tarihinde yayınlanan bir fermanla bu bölgedeki aşiretlerin bir bölümü o yıllarda eyalet statüsüne sahip olan Rakka sınırları içerisine iskana tabii tutulmuşlardır. Gönderilen Ferman, hangi aşiretin nereye gideceği ve nasıl iskana tabii tutulacağı konusunda gayet açık bir içeriğe sahipti. Aşiretlerin isimleri tek tek belirtilerek en ince noktasına kadar bilgiler veriliyordu. [4]

www.arsivakurdi.org



Hûsîne Usibî Aloke û Jina xwe Gula Husî Qande va ber mala xwene.

Önemli bir aşiret kitlesi bugün Suriye devleti sınırları içerisinde kalan ve o dönem eyalet statüsüne sahip Rakka ya bir anlamda sürülmüştür. [5] Fırat nehrinin dirseği olarak bilinen ve çölün başladığı yer olarak tanımlanan bu bölge aynı zamanda Arap nüfusla temas noktasıydı. Rakka eyaleti gelen aşiretlerin yaşamasına pek elverişli değildir. Sıcak çöl ikliminde yerleşik bir tarzda yaşamak, kendilerine özgü bir yaşam tarzı oluşturmuş aşiretlere uygun gelmemiştir.

Dönem dönem yaşanan kuraklık ve bitmek tükenmek bilmeyen Arap aşiretlerinin aleni saldırıları eklenince hayat tamamen yaşanamaz hale gelmiştir.

İskana tabii tutulan aşiretler buraya yerleşimi baştan beri istemiyor benimsemiyorlardı. Zaten gönüllü gitmemişlerdi.

Bunun için de bir yolunu bulup eski yaşam merkezlerine izin almadan geri geliyorlardı. O dönem bu tür davranan aşiretlere resmi çevrelerce Rakka Firarileri veya Rakka Parakendeleri adı verilmiştir. Rakka ya iskan (sürülen) edilen Kürd aşiretlerinin önemli bir bölümü Çîyayê Kurmênç eteklerine, Çukurovanın iç kesimlerine, Sivas Uzunyayla ve eski yazlakları olan Anadoluya geri dönüp yaşamlarını bir biçimde devam ettirdiler. Bu durum bir dönem böyle devam etti.

19. yüzyılın ikinci yarısında değişen koşullar gereği aşiretler yeniden iskana tabii tutuldular. Bir anlamda bu dağınık duruma müdahale etmekti amaç.

Merkezi idare işi bu sefer sıkı tutmak eğilimindeydi. Hemen bir Ferman çıkardı (1864 Islahiye Fermanı) bu fermanı yerine getirmesi için dönemin en

www.arsivakurdi.org

seçkin üç paşasının emrine 5 bine yakın bir askeri güç (Islahiye Fıkraları) vererek iskan işini hal etmeleri için bölgeye sevk etti. (6)

RAKKA`YA SÜRGÜN

Verdiğimiz bilgilerden yola çıkarak Şêxbilan`ların bütün bu yaşanan larla olan ilişkisi üzerinde duralım. Yukarıda bahs ettiğimiz 1695 tarihli fermanla Rakkaya iskan edilen Reşwan kolları içerisinde Şêxbilan kabileleride bulunmuş olmalıdır.

Bu aşiretin bir anlamda parçalanması anlamına gelmektedir. Bazı kabileler Rakka önlerine giderken, bazıları yerlerinde kaldılar veya bölge içerisinde dağıldılar. Rakkaya gidenlerin bir bölümü ise biraz önce bahs ettiğimiz sebeblerden dolayı eski yaylak ve yazlaklarına doğru gelmiş oralarda kalmışlardır.

Kırşehirdekilerin tarihini incelemeye başladığımızda Rakka dönemi hakkında verilere çokça rastlıyoruz. Elimizdeki anlatım ve bilgilerden iki tanesini vererek konuyu anlaşılır kılalım. Mahmutlu köyünden Asaf Keleş, „Yüksekokul Lisan

Üstü Tezi“ ni kendi köyü üzerine yapmıştır. Söz konusu tezde köyün tarihi ile ilgili bilgileri verirken amcası „Hecîyê Milî Omî Momî Usike“ (Haci Deniz) yi kaynak gösterek köyün tarihi ile ilgili şu bilgiyi aktarmaktadır.(7)

„Mahmutlu köyünü kuran atalarımız Suriyenin Rakka şehrinde iskan durumundaymışlar. 1745 li yıllarda burada yaşanan kuraklıktan dolayı Sivasın Zara ilçesine göç etmişlerdir. Fakat kendileri göçebe durumunda oldukları için buradaki yerleşik halkı rahatsız etmişler bunun üzerine valiye şikayet olmuş. Valinin padişahla istişaresi sonucu bunların tekrar güneye doğru gitmeleri yönünde karar çıkar. Bunun üzerine Malatya,Antep Adıyaman platolarına yerleşilmiştir. Göçebe hayvancılıkla uğraşan atalarımız Malatya Yama yaylasına yerleşmişlerdir. Buradan Sivas Uzunyaylaya yerleşmişlerdir. Buradan Kırşehir ilinin Malya ovasına gelmişlerdir. Fakat 1847 yılında Osmanlı Valisi Derviş Paşa tarafından Malya ovasında mecburi iskana tabii tutulmuşlardır.“(8)

Sevgili Haci Deniz, benzer içerikli bilgileri bizede aktarmıştır. Ara sorularla ve başka bulgularla devam ettirdiğimiz sohbetimizde bazı olgular daha bir net hale gelmiştir. Örneğin Rakka nın terk edilmesi kuraklıkla birlikte biraz önce bahs ettiğimiz gibi burasının yaşamaya elverişli olmaması ve Arap aşiretlerinin bitmek tükenmek bilmiyen saldırıları sonucu olduğudur. Diğer yanda aşiretin Uzunyayla ve Yama yaylası (biz dağı olarak biliyoruz) kalışları aşiretin rutin olarak hemen heryıl git-

www.arsivakurdi.org

tiği yaylalardır ve bu sefer zorunlu olarak uzun kalmış olmalıdırlar.

Birde, aşiret diğer Reşwan kabileleri ile birlikte Sivas eyaleti sınırları içerisinde bulunurken yerli halkın şikayetlerde çokca bulunması meselesi vardır. Tahkim Defterlerinde bu konuda yüzlerce şikayet dilekçesine rastlamak mümkündür.

Ama hangilerinin gerçek hangilerinin gerçekdışı olduğu tartışma konusudur. Nitekim yerli halktan gerçeği yansıtmayan bir çok şikayetin olduğuda bilinmektedir.

İskan işini saltanat makamı, bir dönem Maraş Valisi olan Celal Paşaya vermiştir. (Maraş o zamanlar Sivasa bağlıydı ve Celal Paşada Çapanoğlu ayanlarındandır) Vali aşiret çok yaygın ve kalabalık olduğundan bunların etkisiz hale getirilmelerinin ancak parçalara ayrılarak uygun yerlere iskan edilmeleriyle mümkün olabileceğini yazdığı raporlarda belirtmiştir. [9]

Rakka Eyaleti ile olan ilişkilerini daha iyi betimlemek için bir biyografiden kısa bir alıntı yapalım. Mahmutlu köyünün kurucu kabilelerinden birisi olan „Mala Pare“ kabilesinin ileri geleni olan Hecelî Beg (Elîyê Hesî Kûr-1820-1905) henüz genç yaşlarda ticaret ile uğraşmış ve bununla zengin olmuştur. Rakka eyaletinde bulunan Halep şehrinden satın aldığı develeri,



Gula Husî Qande Cavkanî: Mehmet Pala

Kırşehir, Kulu ve Cihanbeyli dolaylarında satmakla ticarete atılmıştır. Bu örnekle anlatmak istediğimiz Hecelî Beg`in ve öncesi kuşakların Halebi alış veriş yapacak kadar tanıyor ve biliyor olmalarıdır.

KIRŞEHİRE YERLEŞME YILLARI

Aşiretin Sivas eyaleti sınırları içerisinde kalması ve sonradan Kırşehire iskanı Eyalet valisi ve aşiret Beg`leri arasında yapılan anlaşmalar sonucu olduğunu bilmek gerekiyor. Şêxbilan`larında bağlı olduğu Beg`leri vardı. Bütün hareketlerini kontrol eden, geliş gidişleri düzenleyen, asker vergi vs. gibi görevleri yerine getiren bu Begi de aşiret ileri gelenleri kendi aralarında seçiyordu. Saltanat makamı da (Eyalet valisi) bunu tescil ediyordu. Yani bütün bu ilişkiler -Reşwan aşiret sosyolojisi içerisinde bir başına ele almamız gerekli-

www.arsivakurdi.org

"Beg" ve "Torin" kastı üzerinden yürüyordu. Torin kastı bir anlamda Begin kabileler içerisinde yaptırım gücüydü. Bugünkü adıyla söyelemek gerekirse bürokratik aygıtı idi.[10]

Saltanat makamı aşiret Begi ile bir kefalet anlaşması yapardı. Buna göre Beg yönetimi altında bulunan halkın herşeyinden sorumluydu ve sorumluluklarını yerine getireceğine dair bir kefalet senedi imzalardı. Karşılığında müktedir olduğunu belirleyen belge anlamında "Mühür", "Kürk", "Kılıç" vs. gibi sembolik eşyalar verilirdi.

